

Omitê Mistefê

# Dîwan

## -hemû helbest-

(1993-2018)

dezgehê
sermedî

## Golegenî

Kambax e rûmet.
Dara sincê bêmizêc e.
Çemê Nîlê diherike biqusûr
Mêjî
ne golegenî.

*Sermawez, 1993/Qahîre-Misir*

## Avê Qurban Rapere!

Avê qurban rapere
û min dayne lengergeheke ewle.
Ji min mexeyide,
hêrsa xwe meyîne
û cardin li min dagere.

*Tîrmeh, 1996/Cida-Erebistana Siûdî*

## De Bila Meçin, Mexwînin! De Bila Meçin, Meşêlin!

Heval li pêşberî min rûne!
Rûçikê min bixwîne
seba kerba min bişkîne
straneke sexte.

*Berfanbar 1997/Xertûm-Sûdan*

## Helbestên Rimbazan

Ximximê borîzan!
Dijmin vedrêj gemar e.
Dijmin vedrêj gemar e.

Gazî xortên çeleng kin
Çiya li wan debar e.
Çiya li wan debar e.

Kulîna diyan vekin!

Xwarin tê de girar e.
Xwarin tê de girar e.

Zexîra bavan vekin!
Şûna wê ya berwar e.
Şûna wê ya berwar e.

Gelo! Peyvan guhdar kin!
Aramî ji Xwedê dibare.
Azadî şêrê siwar e.

*Tîrmeh 2000, Kerbela-Iraq*

**Stêrkek Teyisî**

Saxîsaxî çêrmê jinekê gurandin,
ji her taxê deyûsek civandin,
agirê malan damirî
û li dewsa zamokan singekê tûzikê çikandin.

*Tîrmeh 2000, Ordîava-Nexşevan*

**Dendika Evînê**

Bizmar riziyan, war hilweşiyan
û bêçare man kevokên bejî.
Perikên çavên te bûn kelem
û di sîngê min de çikilîn.

Belekî heliyan,
zîl da çêreya biyanî
û min tu dîtî bûka çiyê!
Li parxana kevirekî
te xwe spartibû evînê
û baranekê tu bi min dayî naskirin.

Min salixên te ji diya xwe re dan
û wê jî bi eslê te derxist;
şecereya te digihand nifşeke bimbarek.
Niha ji bîra min çûne

her çi gotibe derbareya te de;
lê hê di wê rojê de min navek li te danîbû:
Dendika evînê.

*Gulan, 2000/Eşqava-Tirkmenistan*

**Porê Serê Min Vîzvîzî**

Vê havînê
xwîn nakele di rehan de.
Dilê min dê bibe dîzeke bêçembil
û nayê hildan ji ser êgir.

Vê havînê
ger te nebînim
ez ê har bibim.
Hêlînên hemû dûvmeqeskan
divê tar û mar bibin
bi her du destên min
ger te nebînim.

Nizanim ji çi xemê
wisan sergerm im
û porê serê min vîzvîzî.
Îro li vê bihurê,
îşev li vê guherê
wekî pezeke gêj
ku kevirê bêriya xwe
ji bîr kiribe.

*Tîrmeh, 2000 Meşhed-Îran*

**Ahengên Şêr**
**I.**
**Amadehî**

Ger bibit şer an jî aştî pêwistî
têne hilgirtin şûrên hilawistî.
Ta biryarek bête pejirandin
divê tu qet ranewestî.

**II.**
**Temtêl**

Ji hêrsan çav sor dibin
diran dişidin
ala berbijor dibin
ser difirin ji ser cendekan
kalan dişkên
û şûr ko dibin.

Ger serkeftin bête payîn
li dewsa lêdana şûran
peyman xwedîbandor dibin.

**III.**
**Rawestan**

Zar û zêç
li hêviya vegera te ne.
Hê heval hene;
ken û henek hene;
pêlên behran û zozan jî;
lê şûrê xwe bêyî rûnkirin daynene!

*02.06.2003, Stenbol*

**Şemala Rûyê Te**

Li wê derê şevereş bû;
çavan çav nedidîtin;
debara me peşkek ronahî bû
û me ji te deyn dikir defşeyek.

Lêvên me diqirqiçîn;
giyanê me diket gewriyê;
xwîn ziwa dibû di rehan de
û me tenê hêvî dikir ramûsanek
dema fîşeng diteqîn.

Dema astengiyan diajote ser me
em digihiştin remeqa dawîn;
lê cardin hêz diket gehên me
dema şemala rûyê te
ronahî dida civakan!

*02.06.2003, Stenbol*

**Sêrêzikên Zarokan**

a. Bihar hat, havîn jî hat.
Dewar hat, gavan çima nehat.
Çîrokekê bibêje heta ku xewa min hat.

b. Reşo, Reşo berde sê.
Se revî û kete qefesê.
Dêrî bigire, ew besê.

c. Gulok gulok rîsê min,
Heçî kefkanî ye, îşê min.
Da ku neyar neyê tûşa min.

d. Berxa min a deqdeqî.
Gur te mekin şeqşeqî.
Xwediyan meke mereqê.

e. Ref ref diçûn qaqlîbaz,
wek yekîneya li pey serbaz.
Betlaneya we xweş derbas.

f. Kerê we bikurtan e.
Li ser binvîse: Firotan e.
Lê meş_îne mezada hespan e.

**Çarînên Çarmêrkî**

a. Zarokino! Dewr û dewran.
Zarokino! Aş û karwan.
Zarokino! Bawerî û berxwedan,
li benda we rawestiyane.

b. Gelê min wa alaya we!
Wa artêş û pergala we!
Wa dîrok û debara we!
Bilezînin, dem xedar e!

c. Fetla yekan rast here!
Rast here û rast vegere!
Bi çepê her paqij bike!
Bêyî çepê rast jî venagere.

d. Gulok gulok janên me.
Devok devok wêjeya me.
Hindik hindik lê bikolin,
dê were serfiraziya roja me.

e. Hevraz û berjêr wekhev in,
Xwihdan û bergind serhev in.
Ên ku serfiraziyê naxwazin,
di tengasiyê de zû direvin.

**Pêncrêzikên Şêrpencî**

Ez Şêrpencê Makoyî
Şêrê hewaya çiksayî
Li ba min her asayî
Kî li temtêla min binêre,
dibêje: Tu mîr î yan paşe yî?

Şûr û mertalê min mawzer e.
Şûna min şkefta Girê Zer e.
Li pêş dêrî notirvan li ber e.
Ger bixwazî dîtina min,
Tu dê bibînî lana min mêvandar e.

Her roj barê min nicde ye.
Her şev karê min sicde ye.
Heqê neyarê min li vir hucre ye.
Fatîheyê bixwîne li ser neheqiyê.
A ku me dicivîne hev qible ye.

**Welatê Min Dojeh e û Derê ku Ez jî Tê De Serma Dikim**
-helbesta temenekî dirêj-

Beriya ku welatê min bibe dojeh
misteke bihuştê bû.
Ji kaniyên wî aveke zelal diherikî
û zevînê wî şipşîn bû.
Dema ku li her derê tofan radibûn
çiyayên min qadên parastina nifşan bûn.
Dema ku xela û bela dihatin hîmatê
kalikê min sîtilên pişrûkê datanîn ser xaçirganan
û hêsîrên Herdewêlê têr dikirin li berê rêgehan.

Di havînan de belekiyên berfê dadiliqîne xewnên me zarokan
-wekî ku milyaketekî em ramûsane- em di xewê de dikeniyan.
Wê hingê zozanên me pezê sîs ê dêlse nas nedikirin
û rengîniya keriyên me dişibihiya şekirokên Meta Esmerê.
Zivistanan em bi stranekê germ dibûn
û nivînên me yên razanê li ser merşa çîronekan dihatin raxistin.
Teyrekî çilbask binên piyên me digidgidand
û ji kerba kenê, me xwe davête ber nepaxa hesinkarekî.
Em hildiperikiyan şer û pevçûnan
wekî ku em vepelin ber legana girarekê.

Erê dojeh hat û li ser sîngê min venişt
û destê xwe yî rastê danî ser dilê min (ango welatê min î asê).
Lewre çavkaniyên min miçiqîn
û hewayeke kimyewî (hinek jî dibêjin: jehrawî) gewriya min qeland.
Min jî bêyî emadê xwe çavên xwe kutan esmanan
û xwe li erdê veçirikand.
Min her çiqas xwe lebitand,
ewqasî lingên min di kûrahiya dîrokê de gut bûn.
Êdî ez qêriyam û min kerikên guhên newalan teqandin.
Wê jî lêvên min gest kirin
û gilêza wê ya qetrankî diranên min rizandin.
Dojeh li min hatibû xezebê û ji devê xwe agir difûrand;
pey re bi destê xwe yî çepê zimanê min î mezin hilqetand.
Lewre ez mame û zimanê min î biçûk maye
û serê min dihejheje li ber lavija derwêşekî.

Ez dê çavên xwe veneşêrim ji holepîtan
û bila ronahî bi vê karesatê ve lehîm bibe.
Bila ewqasî dojeh bibe sexbêrê reh û rîşên min
ez dê giyanê xwe bigihînim Çemê Erez
da ku hewariya hûfikên Agiriyê ji min re were
û da ku dû nekeve çavên dayikeke kalbajarî.
Bila alem bizanibe ku dilê min dojeh e
derê ku ez jî tê de serma dikim.

*22.12.2007, Stenbol*

## Da Ku Zimanê Te Neaniqe Û Sist Nebe Xîreta Tifingan

*-ji bo giyanê Şehîd Ubeydullahê Agirî-*

Gava tu hatî ber derê bajêr
tu dê bibînî ku bekareta xwezayê hatiye aşofandin
û balyozxaneyên biyaniyan berdevkên xwe şandine betlaneyê.
Wê hingê ber bi min ve were, lê bi newayeke şikestî
da ku per û baskên min bicebirin bi serpêhatiyên pakrewanan.

I.
Tê bi bîra min, zivistan bû
û termên roviyan li ser berfê reş dikir;
tarîban melisîbû ser hêkên genî
û hîvê esmanê Kirmanşanê tehfîr dikir.
Wê hingê te li Şamê dixwend
û te ji min re wêneyek şandibû:
Keçeke neh salî ya filistînî
li pêş tirba Silhedînê Eyûbî
destê xwe ji nîşana serkeftinê re radikir.
Lê te li pişta wî wêneyî wiha nivîsî bû:
"Pend pendên Mûsa ne
lê ji tevgerên firewin ra çi hacet?"

Rojekê
bavo mîhenga radyoyê dabû ser Îstgeha Rewanê
û Şeroyê Biro kilameke evîndariyê belav dikir.
Hemû endamên malbatê wê çaxê digiriyan
lê min Çîrokên Hezar Û Yek Şevî dixwendin.

[Li gorî salixekê
siltanekî osmanî
birayê xwe di landika mirovahiyê de dixeniqand
û jinbava xwe jî li berdestiyê bavê nikah dikir...
filan û bêvan...]

II.
Êdî lêvên min sirûdên mişextî dinehwirînin
û lewre giramiyê nadime şîretên bijîjkan.
Lewre ji giyayên hewşan hez nakim
ji ber ku di bin zixê de tehl bûne.
[Li aliyekî ve jî
li çol û pesaran
bi qasî têra cotkaran
tovên serfirazî û azadiyê hene.]

III.
Piştî şilopeyên axlêveyê
ez dê rûyê xwe badime ber bayekî başûrî.
Bila têlên porê min bibin komeke sazbendan
û ez dê ji te re straneke lehengiyê vebêjim
da ku zimanê te neaniqe
û sist nebe xîreta tifingan.

*28.12.2007, Stenbol*

**Dîmenek Ji Meydana Azadiyê**

Hemû wêneyên jêrîn
ji aliyê wênekêşekî heweskar ve hatine wergirtin
û mafê çapkirina wan ne parastî ye.

I.
Dînekî diranketî û pozxilît
bi destekî doxîna xwe girtiye
û destê xwe yî din jî
ji nûçegihaneke biyanî re hejandiye.

II.
Wêneyê kalekî çûr î çavkesber

di destên komeke zarokan de ye.
Yekî ji wan
bi agirê binikekî çavê rastê qul kiriye
û yên din destên xwe dirêjî binikê kirine.
(Hemû jî dikenin.)

III.
Mîrkutek di destê ciwanekî de ye
li peykerê meydanê ba ketiye
û diyar e ku hevalên wî jî
dixwazin bi dorvegerî rahêjin vî mîrkutî.

IV.
Karkerekî bilindgoyek hildaye
û namedoreke rêxistinê dixwîne.
Hemû beşdaran kulmên xwe yên guvaştî quloz kirine
û binçenga hinekan qelişî ye.

V.
Keç û jin li aliyekî meydanê kom bûne
û diyar e ku piştên wan bi mêran ve arxweyîn e.
Lewre wêneyê jineke rût û uryan
li erdê vedigijgijînin.

VI.
Kalekî porspî li ser pêlikekê rûniştiye
û rihê xwe yî dirêj bi baldarî dişkine.
Mirovekî navsale jî
xwarî tizbiya wî ya erdê-ketî bûye.

VII.
Segekî cehimî ji meydanê tê bidûrxistin
û diyar e ku di bin tayeya erebeyekê de can daye.

*31.12.2007, Stenbol*

**Sirûda Xortan**

Nivişt êdî qetiyane.
Derew êdî riziyane.

Duh û îro cida ne
Hey sitemkar tu niha nadî?
Meş meş ta azadî!
Meş meş ta azadî!

Çiya ji hêrsan diteqin.
Hesin ji kerban ditewin.
Ciwan bi zorê radiwestin.
Hey sitemkar tu niha nadî?
Meş meş ta azadî!
Meş meş ta azadî!

Silav silav gelî şehîdan,
Ji Agiriyê heta Geliyê Zîlan!
Em piştî we negiriyan!
Hey sitemkar tu niha nadî?
Meş meş ta azadî!
Meş meş ta azadî!

*31.12.2007, Stenbol*

**Niyazek Ji Rebê Jorîn: Piçek Ronahî**

Bi ronahiya rûyê Te niyaz dikim
ew ronahiya ku perdeya şevereşê diçirîne
û bînahiya çavan dikudîne.
Ey Perwerdegarê Herî Rajorîn, piçek ronahî!

Her Tu dizanî ku ev zivistan
zivistana kambax a çendan e li welatê min.
Ji ber hişkesermayê
keriyên berazan bêminet daketin deştan
û di şkeftên çiyayan de ruhber qerimîn.
Êdî lê ye lê ye ku tifinga serhildêrekî qeşa bigire
û ji ber biavêjin ajalên bêzar û bêziman.
Li ser navê kal û pîrên hizhizî
û tifalên bêguneh niyaz dikim: Piçek ronahî!

Jixwe gelê min di bin gemaroyê de ye
û hemû cîhan li benda qelandina me ye.

Her çi kesê ku bi vê bêrûmetiyê razî nebû jî
tûşî çendîn bobelatan hat.
Lê ez dizanim ku ronahiya rûyê Te
dê hemû bêbextiyan derdest bigire
û lewre niyaz dikim: Piçek ronahî!

Heke dê dereng bikeve germahiya ku berateya ronahiyê ye
heke ji ber nezaniyên me li me hatibî xezebê
Tu bidî xatirê celaleta rûyê Xwe û carekê li me mêze kî
da ku giyan bê ber xwezaya me bi piçek ronahî.

Heke tu me radestî hevnijadên me bikî
dê çêrmên me bigurên û zêlan ji piştên me vexin
da ku talan bikin Keleha Xanê Çengzêrîn.
Heke Tu me li hêviya destebirakên me bihêlî
dê çavên me derxin û daynin ser kefên destên me
da ku li ser nivîna bavê me rûnin.
Lewre em li ber dergehê dîwana Te amade ne
bi çavên kizgiriyok û lêvên lerzok
tenê ji Te niyaz dikin: Piçek ronahî!

*15.01.2008, Bazîd*

**Kana Rondikan Ziwa Ke Lawo Û Fîşengekê Bavêje Ber Tifingê**

*-ji bo giyanê hemû jinên xwedanrûmet-*

Kalekî
goyî ji min re vegot
serpêhatiyeke gundê Hozê û ez giriyam.
Lê wî ez hişyar kirim bi dengekî bavanî:
Kana rondikan ziwa ke lawo
û fîşengekê bavêje ber tifingê!

Kalê digot ku li gundê Hozê
Îsayê Ehmedî dijiya digel zar û zêçên xwe.
Rojekî romî hatin bertîlan
lê bi hinceta firariyan.
Hêwirze kete nava gund
û jinan xwe veşartin, mêr reviyan.
Romiyan gundiyên destevala dane ber guleyan

û Îsayê Ehmedî vepelişî erdê bêgiyan.
Piştî ku keyayê gund çend zêr belav kirin
û dan fermandarê yekîneyê
zêdetir teşqele dernexistin û vegeriyan.

Zivistanekê
wekî gurên ku birçî dimînin û dadikevin kolanan
romî bêpere man
û cardin berê xwe dan gundê Hozê.
Wê hingê jina Îsayî jî çûbû êzingan
berî her kesî bi teperepa piyan hesiya
û piştiyê xwe avêt, reviya.
Lê duwanzde romiyên yekîneyê
bi fermana fermandarî tev reviyane pêşiyê
ew girtin û vexistin erdê.
Jina Îsayî ducanî bû
û tûşî tecawiza sêzde qebraxan hat li qada gund.

Romiyan dîtin ku jinika belengaz dimire
li ser hemla zikê wê ketin mercê
û xelata mercê: Paçikek cixareya Silahli Kuvvetlerê bû.
Saxîsaxî zikê wê qelaştin
û pizdank rijandin derve bi serê singoyan.

Rehma Xwedê li giyanê te yî pîroz be jina Îsayî
Barzanî tu ji bîr nekiriyî.
Lewre heta mirinê di çemidankê xwe de gerand
mishefek, dîwaneke Melayê Cizîrî
û paçikek cixareya Silahli Kuvvetlerê
da ku tola te wergire.
[Mixabin rehmetî ji kerban nexweş ket
û bi derziyeke jehrîn hate kuştin li tarawgehekê
bêyî ku tola te wergire bi destên xwe.]

*27.01.2008, Bazîd*

**Ferat Hero Jî Diherike**

*-nameyek ji mirovekî azad re-*

Birako,

Ferat hero jî diherike
û xaniyê bavê te hê hê jî li ber e.
Gava dû li ser bixêriya wê dikeve
mêvan bi cil û bergên herêma xwe ve dikişinê.
Lê tiştê balkêş
qerwaşên malê êdî ewqas ne qure ne.

Li gorî nameya te ya dawîn
hilma daristanên şewitî
hestiyên mêjiyê te bihujandine,
gumgumokan pifî êgir kirine
û lewre geş bûye helmeta soxkirina te.

Ma tu nizanî ku hewesa margîskan
bi vêdrokên ciziriyan re hatiye
û lewre bi devên xwe yên biçûçik
avê dikêşin ber bi lûtkeyan.
[Tu dibêjî ku qey ev ajalên bêzar û bêziman
ketine tatêla xwezayê,
lê nizanin ku porê helbestvanekî kiziriye
ji ber xwendina helbesteke Cizîriyî.]

Ez hê hê jî li ser wî kêrtî rûdinêm.
Berbangan
bi dengê dûvmeqeskan şiyar dibim
û nîvroyan
bi gewriyeke qirqiçî
ji paleyan re distrêm.
Wan rojên han
min kilamek avête ser Batmanê,
lê paleyan qerfên xwe bi min kirin û gotin:
Bi van kilamên te
ne zarok ji mirinê difilitin
ne jî zikê birçiyan têr dibe.
Bawer bike ku ez wê hingê tê gihiştim
bê ka çima bêhna niftê
nexweş û birçiyan ewqasî aciz dike.
Heçî ku êvar e
marê hemû zindaniyan tên ber serê min
Lewre ez difizirim ji xewê.

Werhasil Ferat heroj diherike
û xeyalên min bi ro de tên ber derê we.

*07.08.2008, Bazîd*

**Nîşeyek Li Kêlekeke Karta Cejnê**

*-ji birayekî re-*

Birako!
Cejna te pîroz be
û her roja te wekî cejnan bibihure.
*-ez dizanim ku tu jî cejna min pîroz dikî*
*lê dengê te nagihêje min*

Îro gel tof bi tof kişiya mizgeftan,
melayan li ser biratiyê peyam dan
û lewre tu hatî bîra min.
*-ez dizanim ku tu niha di bin lêvan ve dikenî*
*û wiha dibêjî: Lawên xelqê pereyên xwe standine*
*dikarin li ser biratiyê jî peyaman bidin*
*dikarin li ser hukmê xwîna kêçan jî fiteyan bidin*

Tu hatî bîra min, lê ez ne li hinda te bûm.
Her kesî li ser goristanan xêra miriyan belav kirin
lê tu ne mîrî bûyî ku xêra te bidim
ne jî te di nav refên xwe de xwe hejand ku bi bejna te şa bim.
*-ez dizanim ku tu niha rûyê xwe pirçî dikî û wiha dibêjî:*
*Ma ez xeyda stûyê te me?*
*Heke ez li vir bim sedem û armanceke wê heye*

Tu ji şilikê hetanî paniya piyan
di nav kul û keseran de digevizî.
Jana çendîn salan parxana te qul kiriye
û gijika porê te dişibihe maleke talankirî.
Heçî ku dil û hinavên te ne
ew jî dişibihin çiyayê ku di vê roja cejnê de bombekirî.
*-ez dizanim ku êdî tu dê vê kartê biavêjî,*
*ji ber ku xwîn û barûtê birînên te dereve kirine*
*û xîreta te qebûl nake ku banga aramiyê hatiye fetisandin*

Min dê bi riya telefonê
peyameke cejnê ji te re bişanda,
lê tu jî dizanî ku pergala wê tîpên kurdî napejirîne.
Lewre min bi vê helbestê cejn anî bîra te
ew cejna ku ez û tu ne li ba hev.
*-ez dizanim ku te jî bêriya min kiriye*
*bi qasî ku min beriya azadiyê kiriye*

*01.10.2008, Bazîd*

**Xezel – I**

Dema ku tu dikenî
diranên te berfa Sîpanê ne
û dêmên te hewirmişê Çîn û Maçînê.
Ji paşila te kevok difirin
û ez destên xwe bi serbestî berdidim parxanên te.
Ma tu nizanî ku newqên te berqef in
ji bo serhildêrên ku ji zilmê re danexwarine?

Dema ku hêrsa te tê
diranên te çakût û sindanê hesingêrekî ne.
Wê hingê dêmên te vedigerin berpala Oremarê
û xwîna birîna min dimiçiqe.
Wê hingê paşila te dibe tirba pakrewanekî
û lewre bi rêzdarî têm serdanê
û lewre bi baldarî dirozgeyan dixwînim li serê.

Dema ku tu xemgîn dibî
dev û diranên te vedigerin du eniyên dijraber.
Lewre şervan perwerdehiyê radiwestînin
û di hembêza çek û posatan de xwînê dibijînin mêjiyê neyaran.
Dema ku xweza bi zîwezîwa dîlên neyêr şiyar dibe
bejna te ya wekî çiyayekî êdî namilmile
û ez nexweşê vê sekna te me.

*14.10.2008, Stenbol*

**Xezel – II**

Tu dê kengê porê xwe bişkinî
û bêtirs razêyî?
Tu dê kengê bejna xwe ya wekî rihanekê
li erdnîgariyeke azad velezînî
û min bînî xeyala xwe
wekî serbazekî rextgirêdayî?

Îro, sibehê zû şiyar be!
Berî ku dijmin derkeve tetbîqatê
xwe bigihîne Newala Qesaban
û ji min re nameyekê dayne binê kevirekî.
Ez dê îşev bêm dîlana taxê
û heke ji şehîdan şerm nekim
ez dê bi te re rabim semayê.

Dema ku govend betilî
tu dê min nebînî, qisûra min bibexşîne!
Ji ber ku ez dê di bin hîveronê de
kişik bilîzim bi barçêmkekî re.
Heke bi ser kevim ez dê vegerim nivînan.
lê heke têk herim
jixwe axa sar hembêza dayika min e.

*01.11.2008, Bolû*

**Gelo Li Wir Kesek Heye?**

*-gaziyek li ser navê hemû deverên wêrankirî-*

Hebû û hêdî hêdî hate tunekirin.
Şên bû û gav bi gav hate bêşênîkirin.
Kîjan welat e ev?

Navê gel heye,
Lê buruntiya erdê wan di destê hinekên din de ye.
Çanda wan heye,
Lê perwerdehiya bi zimanê wan ê zikmakî qedexe ye.
Çi dijayetî ye ev?

Heke zanistê hebûna şaristaniyekê çespandibe,

lê zirnezanan ev dane berevajî kiribin
ma li wir helbestvanek jî nemaye ku biqîre
da ku serpêhatiya gelekî, erdnîgariyekê, şaristaniyekê bê vegotin
da ku fermiyeta navekî, nexşeyekê, kesayetekê û çandekê bê pejirandin?

Heywax li min,
Cardin ma li ser milên min
banga hawariyê û lewre dirûşmekê berz dikim:
Gelo li wir kesek heye?

*10.11.2008, Stenbol*

**Yabo Ji Min Re Çarşevekê Bikire**

Yabo, barçêrmkên şevistanê li paytextê tarîstana xwe rûniştin
û qecer û qeşmerokên xwe şandin welatê me.
Qaşo dixwestin ku bavan qanî bikin
da ku keçên xwe bişînin dibistanan.
Hinek bav pê xapiyan û keçên xwe radestî destên gemar kirin;
lewre lavahiyê li te dikim û ji te daxwaz dikim:
Yabo ji min re çarşevekê bikire
da ku kul û keserên te veşêrim
da ku xem û xeyalên te neqeşêrim.

Yabo, ji min re çarşevekê bikire
û hez dikî bi aşkerayî, hez dikî bi dizîka
dîrok û rêgeza gelê min hînî min bike,
da ku kedî nebin hestên min
da ku beytû neçin katên min.

Yabo, xwendin û nivîsandinê di mala me de hînî min bike
û min wekî mirîşka hêkê daynene ser kurka xelqê.
Mekeve tatêla maldamayîna min
û min di çarsî û taxan de tazî negerîne.
Sond dixwim ku heke tu ji min re çarşevekê bistînî
ez dê bi qasî jimara şehîdan
stêrkên xuricî li ser devhuçkên wê bineqişînim
da ku di destpêka her karî de çend kêliyan rawestim ji bo giramiyê.

Yabo heke bê bi bîra te pîrika min wiha digot:

"Lawo, tu ibadê Xwedê porê min nedîtibû
û rojekê xwezgînên min hatin û ez bûm jina kalikê we.
Îroj miroj e ez li cem wî me û qet dilê min neavête tenûra yekî."
Yabo ma wê ez hînî kurdî nekirim,
ma wê ez bi toreyên xîretkêşan ve sergihayî nekirim?

Yabo, tu ji min re çarşevekê bikire
û dev ji çîrokên demokrasiyê berde.
Ji ber ku demokrasî çemka Skenderê Makedonî ye
û ez jî neviya şervanên kardoxî me.

*22.11.2008, Stenbol*

**Nasnameya Gelekî Ye Heskîf**

Mêrik bêminet bûne lo,
êdî milên xwe li milên me dixin
û diranên xwe ji me re diçirikînin.
Ma duh jî wisan nekirin
û li ser navê zirbavê xwe av bernedan ser Samsatê?
Ma îro jî serê mêrxasên me jê nakin
û daynanin kêleka wan,
wekî ku kevirên Samsatê danîn pêşangehekê
û nasnameya wê serkut kirin.
Gelî helbestvanan!
Samsat paytexta Keyaniya Kommageneyê bû;
ango bajarê herî girîng ê Koma Gelan;
lewre dijminê xwînxur bû qiraskê serê wê.

Gelî misilmanan!
Heskîf bajarê herî resen ê Mîrîtiya Eyûbiyan e,
ango nasnameya gelekî ye;
lewre zûrezûra têjikên dêlegurê ye li dorê.
Gelî cîhana gunehkar!
Çavê te lê ye ku bajarê Heskîfê jî di bin avê de bimîne.
Lê bizanibe ku em duh sêwî bûn
û mezinên me di serhildanan de şehîd ketibûn.
Lê îro qeysa nalçeya sola me
bi qasî berahiya eniya te bûye.
Ji ber ku em dê jî wekî her mirovî rabin ser piyan

û eniya te pêpest bikin;
êdî mefer nîn e û em dê delavê tofanê bidin ser şova te ya tevnepîran.

*22.11.2008, Stenbol*

**Çi Bikim, Li Vê Cîhanê Newiştê Min Solînek e!**

Li vê cîhanê newiştê min solînek e
û dengê dûzeleya iblîsî lê nayê.
Di her kerdiyekî de
kulmek tovê bextewariyan reh berdaye ramanê.

Dema ku dibe tîqetîqa ewran û bi tavê re dilîzin
ez ji Çiyayê Kurmênc datêm xwarê;
li qûntarê di berqefekê de dikevim xeyala Amedê.
Ji mêrgeke nêzik baqeke kulîlkan diçinim
da ku bidim Guleselama Hesesersistê;
lêbelê dizanim ku Gulê ji van diyariyan aciz e
û dê bavêje ber bizinê.

Divê ez beriya cemseyan xwe bigihînim bajêr
û piştî girtina xefengan vegerim gund
da ku sibetira rojê solîna xwe av bidim
û dem nemîne ji fîqê re.

Di berbangan de cîhan aram e
û dengê sirûdên biyanî rîtma xebata min asteng nake.
Wê çaxê bêdengî ji qêrînê zîztir e
û wijdana axê zûtir bi avê dihese.
Çi bikim, li vê cîhanê newiştê min solînek e
û dema bêhna min teng dibe ji van heyberên çargoşe
ez xwe davêjim bextê keskesora girover, esmanê girover û lêvên girover.

*29.12.2008, Bazîd*

**Tu Wek Spingdarê Û Ez Wek Bayekî Li Dora Te Çûm Û Hatim**

Tu wek spingdarê û ez wek bayekî li dora te çûm û hatim
Tu rawestiyayî û ez wek tav û hîvê li pey te çûm ava û hilatim.

Lewre sermest im û tu wek wêneyekî li Qaqilwaqê mayî
Hêzê didim baskên sîmorxan da ku bizanibî jixwe ez jî dihatim.

Berbangan tu li asoyên zêrîn dinêrî û bêhna te teng dibe
Di şevereşan de bi kincên spî digerî bi hinceta ku ez bêbext im.

Min dinya û alem pê hesand ku tenê ez im yarê te yê rasteqîn
Lê te bi gotina qerwaşên xwe kir û nedipa ku di evîna xwe de sext im.

Heçî ku tu yî, te tu nirx nebirî ji keft û lefta min a bêpayan re
Lewre ez jî bûm serhildêr, li çol û pesarên biyanistanan ketim.

Dema ku ez ji kolana we qeriyam, nav û nûçik bi ser te xistin
Lewre êdî ez dê neyêm wan derên ku tu lê yî, ma ez bêrûmet im?

Êdî mêzera te ya hewirmişîn bala min nakêşe dema ku dimilmilî
Çavê min li şevbihêrkeke xizanan e û bi dezmaleke patisqe dilrehet im.

Hez dikî êgir berde jûra xwe û hemû hezkiriyên xwe bavêje navê
Lê ez niha bengiyê dozeke din im û di pêşniyarên te de net im.

Dema ku endamên malbata te ji welêt reviyan bi kelek û keştîbaran;
Ez jî hilkişiyam lûtkeyan da ku silavê bidim ewran û ji wir neçim.

Guhên te di bin balîfan de bin jî, esmanê bêstûn nalîna min dibihîze;
Min vedixwînî dîlanên giregiran, qey nizanî ku li pişt kemînan birext im?

Navnîşana min şikêrên bi cendekan tijîkirî, wêraneyên bi ser zindiyan tepkirî;
Ger nêta te rast û mîza te paqij be navê min hilde, tu dê binêrî ku çi zû hatim.

*18.01.2009, Stenbol*

**Ger Ez Rawestim Bi Tehrekî An Jî Bêm Rawestandin**

Bendîtî kurmek e, lê kurmê te kişande azadiyê;
Lewre te hevseng serobino kirin li dijî bêdengiyê.

Bala te li astên bala, tara te heft qatan binerd e;
Ji bo avahiya te peyvan wate dizîn ji bedewiyê.

Xwedê Adem biziman afirand, hîn kirê axaftin;
Ademî soz û qerar ji bîr kirin, derkete qurbetiyê.

Hey wêjeyê! Hem tawanbaran bi te xwe veşartin;
Hem jî dadweran bi te vekirin rûpelên lehengiyê.

Çend ziman hatin hilqetandin, lê tîpan tu nimandî;
Çend dewran guherîn, lê tu mayî wek mora eniyê.

Çend cendek bi qesarê hatin bihujandin di çalan;
Lê heyam bû guwahê te li hemberî hemû kirêtiyê.

Ger ez rawestim bi tehrekî an jî bêm rawestandin;
Tu dê salixê bidî bê ka çawa bûm nêçîra neheqiyê.

*11.02.2009, Stenbol*

**Ji Stenbolê Temaşe Dikim Amedê Bi Çavên Vekirî**

Rêwingo,
vê nameyê bigihîne şêresiwarê Xana Rihayê
da ku neks lê neçike li wê girava golegeniyê.

Erê lo, ez jî dizanim ku hemû nameyên wî
pêşiyê diçin ber destên zebaniyan
û paşê venagerin li xwediyan.

I. Nameya ji Stenbolê
Delîl û dêran li halê kinişt, dêr û mizgeftên vî bajarî:
Ev bajarê ku haxamên wî di roja şemiyê de çûn masiyan,
keşeyên wî rûyên xwe badan ji şîretên hewariyan
û melayên wî xutbe xwendin li ser navê Tîmûçînê Tatarî.

II. Bersiva Nameyê
Amedê temaşe dikim bi çavên vekirî
ew bajarê wek sindoqa devmorkirî.
Bedenên wê diranên xortekî şkêncekirî
û riyên wê digihêjin hêviyên min.

Amedê temaşe dikim bi çavên vekirî

ew bajarê li besteke rast veleziyayî.
Êdî zeviyên wê bi gayên qelp nayên cotkirin
û mîratê gayê çandiyarekî
nîr şkandiye bi hesreta zozanên Şerefdînê.

*20.02.2009, Stenbol*

**Were Yarê, Wekî Her Carê**

Wekî her carê, were yarê!
Bila ji paşila te kevok bifirin
û haleyeke nûranî bibe toqeya dora serê te.
Bila lêvên te ji diranên camaxî bibişirin
da ku bijîjkên bajêr dev ji karî berdin
û ji Hîpokrat re dijûnan berz bikin.
Wê hingê ez dê jî bi helwesteke gelêrî
şûşeyek ava bêarsenîk li pey te birêjim.

Gava tu ji pişt perdeyên hesinî
an jî ji lûtkeyên Tendûrekê daketî Bazîdê,
ez dê ji sergovendiyê derkevim
û ji ber kêfa dîtina te
dê çepikan ji bîr bikin temaşevan.

Were yarê, çêja jînê bi te ma.
Were yarê, rewneqa dinê ji te ma.
Were yarê, wekî her carê
û mebêj: Çima?

*17.03.2009, Agirî*

**Hevalê Encaman**

-ji bo Nîhad û Biharê-

Dema ku min serê xwe da ser vê riyê
sedeman ez kaş û berkaş dikirim.
Wan heyaman ez di xwe de diheliyam
û pirça serê min vîzvîzî dibû.
Hey gidî dewranê!
Min çi kaş û kerîş nezêrandin

û kama çend matoşqeyê bi xawêna min neşkest.

Di dawiyê de
popên vê ometê bi min bawer nekirin,
û lewre wek çemekî war bi war geriyam,
heta ku rojekê di çaterêyekê de rastî te hatim.
Ez qurbana wê qasê ku min tê de tu dîtî,
ez qurbana wê dasê ku bi ser wî qamîşî de şiqitî.
Ew qasa ku di destekî te de daseke xarkirî,
di destê din de defşeyek kirpa bîj
û piyariyê ji dilê te koç kiribû.

Hey hevalo, hevalê encaman! Êdî xem nake,
bila ewqasî stûyên katar-qalind û zikên têrdek bikêşin çîta navberê
em dê cardin vegerin destpêkên berê
da ku çirayekê pê xin û şemalê bidin her derê.

*29.03.2009, Stenbol*

**Ev Silav Ne Bertîl E!**

Tu ji xwe re li wir bigere,
bila hêviyên xortan bi tayên porê te ve bialiqin
û bi xatirê kenê te
bila geştiyar wêneyê te bikêşin da ku bikin kartpostala sersalê.
Ez dê jî li vir bihelim
û bila hilm û gilm ji ser serê min qulozî cem te be.

Min dê devê xwe venekira,
lê kambaxa keserê bû xeneqûtk û kete gewriya min.
Lewre min jî silavek ji te re şand bi bayê rojavayî
da ku kuxtekuxta min bibire bersiva te.
Lêbelê bersiv nehat
û li gorî gotina nasên te
guhê te li kilameke Karapêtê Xaçoyî bûye.
Hey bêbextê!
Stranên li ser taximê sîng û beran guhdarî dikî
û sîngê min dispêrî rimên xemsariya xwe?

Tu jî dizanî ku heyamekê

porê min dadiweşî ser kulangan;
diranên min wekî berfê çîlspî bûn
û zend û bendên min
wekî çakûç û sindanê hesinkarekî dibiriqîn ji ber xebatê.

Ez jî dizanim ku êdî dewran guheriye
û heke ji te re bibêjim merheba
bersiva te dê bibe çend heba?
Lê bizanibe ku ev silav ne bertîl e:
Ji ber ku xîmê huqûqa me li ser silavê jenandî bû.

Bi ber xwe mekeve,
car heye mirov zimanê xwe yî biçûk jî qurt dike
û niç fayde nakin
car heye kanî di axê de diçikin
û hilkehilka qirikên tî naçe guhikên qaqlîbazan.

De ez li vir im, li warê me yî berê.
Dema ku dost û nas dibihurin û silavê didin
bêemad çav li te digerin.
Mixabin silavan bêyî te werdigirim:
Ji ber ku li vir bêsilavî xwînxurî ye
û bêbersivî jî bertîlxurî ye.

*10.04.2009, Stenbol*

**Heft Xezelokên Qerfî**

**I.**
Vê seherê yar derket ber pencerê
Lê hezkiriyê wê kartol difrotin li jêrê.

Di destekî baçikek, di yekî de telefon
Lê hezkiriyê wê rê dipîvan wekî berê.

Lêvên yarê bi soravkeke çînî sorkirî
Lê hezkirî ji bo hingilên bêslîkon dikêşe keserê.

Miza lotikxaneyê giran e, lewre li jûrê direqise
Qelendê wê pişt şikandiye li hezkiriyê mehderê.

Kar û kusba Umîdî di van evînan de nîn e
Lewre ziq nabe û nasekine li çata rê.

**II.**
Yar digel diya xwe çend caran çû serdana heciyekê
Da ku diyariyî wan bikin mûriyeke mirazan û şemsiyekê.

Hezkirî jî pişta xwe da qelaxê û baçikek erzan kêşa
Lê joleya porê wî şûşt kambaxa şiliyekê.

Yarê guh da kilamên evînê û şevan bêxew ma;
Gelo lewre toreyên evînê pirçiqandin bi tiliyekê?

Hezkirî jî kete pey qezenca nanê zarokan
Û nehat xewna wî çîroka zembîlfiroş qe kêliyekê.

Yarê go: Bêumîdî qerçûmekan li goşeyên çavan zêde dike
Hezkirî go: Maldamayîn çêtir e ji maça diziyê û êşa salekê.

**III.**
Awirên çavên yarê tîr berdan sîngan wek leşkerên Holagû
Hişê hezkiriyî ma li tiradê wek kêzika ku digindirîne hola gû.

Van deman piraniya hezkiriyan heweskar in wek berazan
Lew temenê yarê di naskirin û senifandina wan de beytu çû.

Ka ew hezkiriyê ku por dide ber jilêtan û kum dide ser qafê rût
Ka ew xîretkêşê ku çû meydana paleyan û qelend da hev zû bi zû?

Ger yar bi tiliyên bêoje gazî taldeyekî bike hezkiriyê xwe
Dibe ku nikaribe were, ji ber ku belengaz hêj nebûye şû.

Da ku tehn û niçên bav û birayan neçe guhê hezkiriyan
Divê hetanî reşemiyê bixebitin û ji rehetiyê re bibêjin: Tûûû!

Ger te divê şûnameyek lê bê nivîsîn navê te digel ê yarê
Umîdê ji yarê bibire û çav berde keça wê ya ku jê çêbû.

**IV.**

Lêvdoranê -vê seherê- kerane vepelî ber taştê
Paşê gincir li xwe kirin û çendekê derket geştê.

Heta êvarê sûq û kolan li hev qelibandin
Lê hezkiriyê xwe yî barkêş nedît Xwedê kuştê.

Dêmên cinperiyê ji ber soravkê peritîne
Miraz di çavan de mayê, bêhêvî ye ji bihuştê.

Tiliya wê ya hirçane çendî ku işaret kir jî
Hezkiriyî destmala wê ya bêhnkirêt avêt lêmiştê.

Yar bi dengê bûmê û tevgera qirdan tê civanan
Lê hezkirî xwe vedişêre da ku nebe dîdarê wê ziştê.

Gêjikê çend salan xwend kesnasî û girsenasî
Gotî bibûya pispor, lê xwe elimande fîştefîştê.

Heke dadrêsê cemawerê hîç umîd nebûya ji vê evînê
Dê balkêşnameyek bişanda kolika vê bedrewiştê.

**V.**
Dost û dijmin rarûyî hezkiriyan ketin
Heta ku aramî ji ferhenga wan derxistin.

Çi wexta ku hezkiriyî bi ser tayê yarê de bada
Êdî misk û enberê rû badan, ji mala wî derketin.

Heke yar li mala bavê xwe jî xurexurê li xewê xe
Jana evînê dike ku kar û barê hezkiriyî bêbereket bin.

Xwedê jiyana bêumîdan têke para bavkuştiyan
Ku riya evînê dan pêşiya xelqê û jê bi dûr ketin.

**VI.**
Yar têrxur e û hezkirî ji fîrefîra wê bêzar e
Xewn û xweziyên yarê bêdawî ne, lewre evîndar bêwar e.

Pistepista peyvan e di ber diranên ketî re difistiqin
Gotegota wê mêjiyê serê evîndarî dikoje, lewre pê nikare.

Selexaneyê bi badeya işqê daşir û avrêjk şûştine
Pijikên rûyê xwe bi destê evîndarî teqandine, rebeno jar e.

Heke evîndarî nebûya dê qedrê helbestan çi bûya?
Heke Umîdî helbest hûnandibin wisan e ne evîndar e.

**VII.**
Yar wek zebaniya ber derê dojehê ye
Kunda şevê û pepûka serê sibehê ye.

Her dem sikûmê wê pirçî ye, wek hevirê hilpesirî
Bersiva wê otomatîk e, wek tetika sîlehê yê.

Gerdena wê wek tixûbê neyaran mayînkirî ye
Bi gezan diteqe û nivîna evîndarî zindana kelehê ye.

Umîdo, bextê evîndarî qurbana bextê qijika reş be jî
Bûye qantirê barkêşiyê û dizgîn di destê filehê de ye.

*30.04.2009, Stenbol*

**Di Heyamên Bêevîniyê De Du Xezelên Rexnegiriyê**

**I.**
Çoqildirêja min têjika mişkekî ye
Ne tu tişt e, lê hew dizane ku bi kêrî tiştekî ye.

Şeleyekî kermeyan dide ser devê qoşxaneyê
Pîşe ji dê hildaye, hiş qurbana rişkekî ye.

Ger bikene, dev jev diçe û kef bi dêv dikeve
Ger bigirî, tu dibêjî qey qîqeqîqa mirîşkekê ye.

Gava bikeve henekan, bi lekm û pencirûkan tê min
Gava xwe bide naziyan, pê dihesim ku qîza pûştekî ye.

Çeleçel bike, ji ber tûka dêv direvim
Deng lê hesret be jî, dil li pey nemûşkekê ye.

Çîqpîpik e, sercûcik e, simker e, hûrtirş e
Bah nemaye, li ber bayê min mîna qirşekî ye.

Bi ser de herim, bêhn bêhna kêzika fisê ye
Jê dûr herim, çêreya nav peynê lêmiştekê ye.

Porgevel e, qilêra pêsîrê titqaltitqalî ye
Gerden belekbelekî ye, xala dêmê mîna palûşkekê ye.

Şirtava çavan û xerêfa guhan di te de bîz nahêle
Xilîtka bêfilê jê re mînanî berateya qudoşekê ye.

Devçewal e, pişthotik e, çavkortik e
Af û nifira rebenan di stû de wek nivîştekê ye.

Ger raweste, mebest peyameke bazirganiyê ye
Ger biqilqile, di nav dev û diranan de mîna benîştekî ye.

Li ber paceyê biniçeniç e, li ber dergehî bikastekast e
Lexer e, kelpeziya rêlê carê bi rewiştekê ye.

Tirmaqûl e, hêzdaqûl e, riya li pêşiyê xûl e
Qelend bi kîsên zêran e û cihêz barê piştiyekî ye.

Umîdo, felek dost e, ger yar xwe li xaynetiyê dayne
Hiştin û gihiştina mirazan jî li gorî newiştekî ye.

**II.**
Cinîsuriştê, Xwedê kuştê, qe nehiştê cardin xedeng kişandin
Hişgeniyê, çavşêliyê, meşqijniyê cardin derew weşandin.

Sersîtilê, guhbercilê, hemû rindiyên jiyanê kirin kilkilê
Hişalozê, pozqulozê guh da nûçeyên derewîn û tovên nifaqê reşandin.

Xalbipirçê, awirxilçê bi dengê hirçê derket ji pinikê digel bêhna zîrçê
Bixêrnehatê wek karesatê xwe li nava civatê rada û xîret herişandin.

Zimankefgezkê, sikûmkelpeziyê her danî kirasekî bedyomiyê li xwe dike
Dilrivînê, paşilsarê, mîna mehîna bêhefsarê hespên zomeyê giş tewişandin.

Devşekalê, zimançeqelê, kincqerpalê hat ji palê û bû qiraskê serê malê
Lingkulekê, nefsçilekê, hêtfisegurê ga derxistin di kulekê û xwedî pê nehesandin.

Serjûjiyê, bêmêjiyê ji malê reviya û kete tora qebraxan bi eşqa dengbêjiyê
Mîzqirêjê, bênimêjê bi xet, nivişt û lavijê bext girêdan û ocax hilweşandin.

Serkundirê, totikvalayê mîna belayê ket pêsîra xelqê û bû sedema xelayê
Çavzoqê, dilreqê zêl vexistin ji pişta xelqê û her yek di aliyekî de şandin.

Umîdo, dev bêkilîdo vê teresbavê xwe kir hoçkê destê pêto û gel kir dûdo
Lê tu ji meydanê venekişe, ji bo rûmetê tê bikoşe heta ku te xîretkêş civandin.

*07.05.2009, Stenbol*

**Rojnivîska Zindaniyekî**

Bi hilatina rojê re xem dimeşe xopana zindanê,
bi daketina şevê re sehm diweşe wêrtasa zindanê.

Derî li pişt dergehan, dergeh di sûrên berz de;
sûr bi keserê qul dibin, dilîn berze ye li zindanê.

Kezeb û pişik tê de xera dibin, neks tê de diçikin;
stran lê qedexe ne, stranbêjî dest pê dike li zindanê.

Ode kunên cirdanan, germgermok kar û barê rojane;
jimare di stûyan de hilawestî, stû xwar in li zindanê.

Serdan bi destûran, destûr di nav qîlên berazan
rovî li holê cirîd dilîzin, şêr bendî ne li zindanê.

Di çendîn qulikên tarî de çendîn serî dipelixin;
serî go ne, go li ber piyên zebaniyan li zindanê.

Jehr dibijine jiyanê bi nûçe û teşqeleyên li derve;
teşqele wek tîrên rakişandî amade ne li zindanê.

Mirin hevalekî dilsax e, dem hestiyan dikoje
mêjî fermana qirkirinê dide şaneyan li zindanê.

Mêr tê de dixesin, jin tê de diçin ser darê mêran;
dawiya mêrxasiyê kindirek e li arîkê zindanê.

Xwarin lê bêçêj e, çêj li derveyî bedenên têlkirî;
têl bi têl spî dibe por, zûtirkê diweşe li zindanê.

Şev û roj yeksan in lê, tê de jin û mêr yeksan in;
Ger dadwerî hebe jî, dûredest e ji bo ehlê zindanê.

Xew tê de kurt e, dil tê de pirtepirt e wek pilteyê;
kirtekirta solên zêrevanan hişyarî ne li zindanê.

Pênûs amûra raznivîsan, raznivîs di ber teftîşê;
tedhîşê em canzerî dikirin di heyama zindanê.

Roj hat ez jî ketim wê kambaxê, jê derketim jî;
bawer ke zanîna min kemilî li hêwana zindanê.

*24.05.2009, Stenbol*

**Di Kelegerma Havînê De Rondikên Hênik**

Dîsa havîn hat, bi kelegerma xwe ya navdar ve.
Mirovan kincên rengvekirî û tenik li xwe kirin,
ajalan pûrt weşandin an jî kiras guherandin
û rehekan bi zêravê serên xwe şûştin.
Dîsa havîn hat, bi kelegerma xwe ya navdar ve.
Mirovan bêzarî nîşan dan,
ajalên bêzar û bêziman xwe avêtin berê sihan
û rehek xeyidîn ji av û baranê.

Îro min jî edetî nasan
kincên rengvekirî û tenik li xwe kirin,
bîranînên xwe raxistin zevînê kul û keseran
û dêmên xwe şûştin bi rondikên zîvîn.

Di kelegerma havînê de
rondik sehekên mirovî hesas dikin:
Lewre mirov
xwêdana têrxwarî û paleyan ji hev nas dike

dema ku li navgîneke rêwîkêş siwar dibe.

Di kelegerma havînê de
rondik dilê mirovî jî hênik dikin:
Lewre mirov balsivik dibe piştî girînê
û hişkehişk di destê xwe de digire bendê hêviyan.

Di kelegerma her havînê de
dema ku tav dimelise ser mêrg û zeviyan
hilkehilka newqên ruhberan rehmê didin ber dilan,
lê xweziyên te bêhnê didin ber lexeriya min
û tebata kêlindiya min namîne
li pêşberî simbilên cêh û gênim.

Di kelegerma her havînê de
dema ku çiya serên xwe serqot dikin
û egalên ewran davêjin aliyê Laçînê
darên Baxçeyê Keşîşî li ser serê kê fors dikin nizanim,
lê ya ku dizanim: Havîn û evîn li hev tên
berbang digel çîveçîva çivîkan tên,
tu têyî bîra min û rondikên min datên.

Di kelegerma vê havînê de
betlaneya dibistanan bike bihane
û were serdanan.
Ez dê li warê me yî naskirî bim;
di sibeha zû de were, berî ku kanên rondikan biqelin.
Hevdîtina me nehêle êvarê, piştî ku bûm derkevin ji qelîştekan.

*08.06.2009, Stenbol*

**De Ka Bibêje Di Cihêzê Te De Çi Heye?**

Sureyayê merheba,
roj bi ewran nebiliya û gera xwe kemiland;
ez jî bi dewranê nexapiyam û min evîndariya xwe peyitand.
Niha tu li qeraxeke Zeryaya Spî rûniştiyî,
fir û perwazên gulingan temaşe dikî;
lê raman û nîgaşên te
-wekî karwanekî li dû hev rêz bûne

bi Riya Hewirmişî diçin Çîn û Maçînê.
Bawer nakim ku haya te ji êşên min heye:
Her roj salvegereke êşên min e,
û her kêlî qeyraneke derûna min e.
Qe li Fasê çi nûçe mane lê?

Sureyayê,
Fas welatekî germ e, nas nake berfê;
jiyan lê yekneseq e, peroşî li wir ketiye zikê qerfê.
Lewre te vedixwînim Kurdistanê:
Warê çiyayên serbixêlî û zozanên hênik.
Çi gavê keysê bibînim
ez dê bi refên qulingan re werim xwestina te
û bi balafirekê te rakim esmanê kamraniyê.

Lê Sureyayê,
Min bazara sola te li Qersê kiriye,
cil û bergên te ji Colemêrgê anîne
û kofiya te ji Amedê kiriye.
De ka bibêje di cihêzê te çi heye?

*02.07.2009, Bazîd*

**Ewr Silikîn Ji Ber Rojê, Yara Bedew Derkete Meydanan**

Ewr silikîn ji ber rojê, yara bedew derkete meydanan,
çavên wê wekî donmeyekî selanîkî tim li min geriyan.

Min bi sikûmekî pirçî hesabê roja xwe dikir, wê bi geşî
got: Ma çerçî azadiyê radixin li kuçe û kolanên aranan?

Min go: Peyva azadiyê hê nebûye marqeyeke tomarkirî.
Wê go: Rebeno, ev peyv ewqas ne erzan e ku bê firotan.

Min go: Min bike dîlê xwe û bila azadiya min bibe marqe.
Wê go: Min navê te tomar kir, de derkeve ji nav bazaran.

Îroj miroj e di qeydan de her li benda azakirina wê me,
lewre êdî ez dê neyêm xuyan di çalakiyên li girebajaran.

Hevalino bibexşînin, êdî ez dê neyêm şevbihurkên we,
ez dê piyên yara azadîxwaz bişom berbang û berêvaran.

Bila dîlan bigerin û kaniyên stranan tu car nemiçiqin,
Ez dê rojekê werim digel yarê bi ser rikê wan neyaran.

**01.08.2009, Bazîd**

**Erzehalek Ji Îhsan Nûrî Paşeyî Re**

Fermandarê min!
Te jiyanek li pey azadiyê peritand,
dirûşmeya xwe bi xwih û xwînê nivîsand
û mêrxasan jî şopa te kudand;
lê em çalepîka mane
lep û serçongên me taşirxanî bûne,
rih û neynûkên me dirêj,
serpêhatî û dastanên te di arşîvan de qirêj bûne.

Hey mêro, mêrxaso!
Berekên nûhatî di paşilên zindanan de ketin xewê,
li hemberî dozgeran hêviyên xwe şe kirin,
li ber qemçikên şkencekaran reqisîn,
bi elektroşokê ketin cezbeya sermediyê
û di rojiyên mirinê de dîlanên şeranî girtin;
lê qerînên min qantir zewandin
da ku xort destên xwe hene bikin
di qiyameta Agiriyê de.

Hey mêro, mêrxaso, şêro!
Dijminî ala û forsên xwe çikeçik di lana te de çikilandin,
rêhevalên te yên leheng saxîsaxî gurandin,
daristanên Qeşqeşkê terîterî şewitandin,
gemaro da ser gelê te,
çek û posat jê standin,
rûmet û anora wan bi titûn û barûtê herişandin
û hemû peymanên mirovahiyê li besta Helacê dirandin.
Lewre ez helbestvanê bêgav
betal mam, bûm gornebaş
û min erd û esman kola

da ku rastî destxeteke şoreşa te werim
û sirûdên te cardin çap bikim
ji bo xatirê zarokan.

Hey mamosteyê azadiyê!
Peyva min çivîkek e di qefesa min de;
lêbelê min ji bo te şûşeya dilê xwe şikand
û çivîka xwe firande esmanê qelişî.
Êdî çivîka min bi gernameyeke sorgevez perwaz dide
li ser erdnîgariya welatê te,
silavan dide paleyên zeviyan
û şivanên li ber keriyan.
Vê erzehalê jî ew çivîk tîne,
ji ber xwîna sîngê min rengê wê sorgevez e
nebê nebê sîxur bihesibînî.
Parola: Hilbê Agirî hilbê!

*15.08.2009, Bazîd*

## Helbesta Ku Beriya Fitarê Tê Xwendin

Te guh da lavij û dirozgeyên melayekî
û rojiya xwe betal kir.
Vî elokî
hest, rûmet, pêkvejiyan û zanist kirin qurbana ziktêriyê;
ji te re mewlûd xwendin bi dengî,
ji te re nivişt çêkirin bi her rengî,
rastî û navên evra ji te veşartin
da ku ji bereketa şîv û paşîvan mehrûm bimîne
karpêka te ya ber pejirînê.
Li taxa me jî elokek heye.
Li gorî vî elokî jî:
"Xwedê yanzdeh mehan derdikeve seyranê,
di meha remezanê de em tên bîrê
û lewre di vê mehê de datê zevîna me.
Ew e hêzê dide gawestiyan,
Ew e hilmê dide ber zengiloka fetisiyan,
Ew e çavnêrê şerpezetiya xizanan
û Ew e şifadayiyê kulên nexweşan."
Lêbelê nayê ser zimanê vî elokî

Ew Xwedayê ku pirtûka Wî bi tefsîran
pêxemberê Wî bi riwayetên derewînan
û malbata pêxemberê Wî bi şûran hatiye qepeçekirin.

Ji îro pê ve
tu guh bide fetwayên Feqîhê Teyran:
Beriya fitarê cûmek evîn bavêje ber diranên hişê xwe
û bila ji xwe re vekayê hetanî êvarê.
Piştî imsakê cixareyeke nifrînan
bide ber lêvên dilê xwe
û bila dûyê bombebaranan ji guhên te bavêje
da ku bizanibî:
Di seranserî vê mehê de
aştiya lexer leylanek e
û daxwarina newêrekan bi silavekê dest pê dike.
Di vê mehê de tu guh bide dengê neyê
û bila dendikê defa qereçiyan
dahola aramiya te nezêrîne.
Roja cejnê, beriya nimêjê
fitra xwe bide xortekî çeleng
da ku ji xwe re bikire
qatek kincên Mishebê Umeyrî ji sûqa Uhudê.
Piştî nimêjê here serdana goristanê
û di ber serê her kêlî de biqîre:
"Bihuşt di bin siya şûran de ye
dernekevin pêşwaziya min"

*31.08.2009, Bazîd*

**Belengaz Vê Havînê Jî Birçî Man!**

Faîza deynên bav û kalan,
belengazên welatê min derxistin serê riyan.
Lewre Kalê Pîranî daqûlî xewnên wan bû,
û lewre li Lazistanê
di lêkenda tûkê de xeniqîn qelareşkên hersalî.

Henaseyên qirikên birçî
reşên şevê dan ber quncirûkan.
Lewre bêhna efûngê xwe avête qijdeyên sûtalan

û lewre axoziyên gîsnê bav û kalan
wekî berxekî mîjo bi hingilê dadweriyeke neban ve daliqiyan.

Belengaz vê havînê jî birçî man,
lêbelê zik li wan hilpingirî
bi rik û înka hezar salî.
Di vê babetê de bijîjkekî dêrsimî şîreteke wiha dide:
Divê ev cureyê sitemzedeyan
vereşin ser rûyê sitemkaran
da ku veterisin û rizgar bibin
ji jana cotstandardiyê.

**Xezal, Xezal Telqîna Saxan Bixwîne!!!**

*-di kesayeta te de ji hemû pakrewanan re-*

Gelo zimanê te yî zikmakî qedexe bû lewma navê te "Ceylan" danîn Xezalê?
An li navdareke bedew nihêrîn û lewma navêkî wisa ji te re nimandin Xezalê?

Ma te ji riştеya destan hez nedikir, lewma te ji diya xwe miqarne xwest keçê?
Ma te nizanibû moşek cendekan di pêşa dêreyan de didin berhevkirin Xezalê?

Dozgerê komarê wêneyên te yên dawîn çima li raya giştî belav nekirin pitê?
Ew dîmenên sik û sar çima weşandin û kezeba gelê te wiha peritandin Xezalê?

Parçeyên cendekê te nebûn şarapnel di çavên wî bel'amê ku qaşo mele ye,
laşê te li ser mêza guran kelaştin û segê şivaniyê çima êriş nebir ser wan Xezalê?

Îro laşê te di bin axa sar de ye, lê rûmeta cîhana bêdeng ber mezada rûreşan e
Xezal, Xezal telqîna saxan bixwîne ku cardin govendan bigerînin bi strana Xezalê.

Êdî kes nikare pêşiya zêmaran bigire, ma kengê axê berateyên xwînê veşartine?
Çavên min tasa xwînê, bila bibin qurbana wî cendekê kirtimkirtimî hey Xezalê!

*04.10.2009, Bazîd*

**Pesna Yarê**

**Pêşek**
Roja ku çavên te bi min ketin
telp û rivîna xwezanînê bi cendekê te ketin

û wê çaxê hingilên te bijiqîn, kemaxên te şidiyan.
Roja ku çavên te bi min neketin
Ziman li te bû kulavekî şil û afnikî, bizûz ketê.
Roja ku çavên me bi hev ketin
ne berxbir bû ne beranberdan
ne aramî hebû ne serhildan
û xema kurtepistan
segekî pîr bû li hêşiya konekî.

**I. Rû**
Enî çar tilî, dêm di qeysa du kefedestan,
çav zeytûnên Nablûsê,
Kaniya Qestelê lêvan dinimîne
û diran çîtek ji şekirê Tewrêzê.

**II. Gerden**
Çi xweş sekiniye ew ser,
li ser wê gerdenê.
Nîv buhist stû: Pireya di navbera sîng û erzenê
Heçko çiçik in: Du pîramîdên bi tehrê firewnî.

**III. Navkêlk**
Navkêlk saeteke xîzê ye.
Çawa ku xîza taqê jorîn datê xwarê
her wisan hêt digivirînin goştê navikê,
loma sor û gizirî ye.

**IV. Pî**
Remilvan deverûyî erdê bûne
û pêşeroja êlê bi şûnpiyên yarê ve girêdaye;
lê ez bextewar im,
her roj wan piyan tazî tazî radimûsim,
hişê min bi xweşiyên duhî ve aliqî maye
û ji min re ev kar sermaye ye.

**V. Dest**
Pirtiyê Keşmîrê li ber destan sond xwariye,
lewre bîs û razên xwe vedişêre
da ku nermahî û rindahiya destên yara min
bibin havênê hêjahiyê.

**VI. Por**
Por bi qasî bextê romiyekî reş
û bi qasî hêviyên Pîremêr geş e.
Çi gava yar mêzerê qîzanî girêde Qerejdax şerm dike
û her çi gava keziyan vereşîne jî hetanî parsûyan diweşe.

**VII. Bejn**
Spingdaran
xwe li ava zeryayê girtin
û di leylanên çolistanê de çilmisîn.
Rihanan
xwe li beravan girtin
û di hendefên kûr de şeqizîn.
Lewre êdî bejna yara min
wekî pîvaneya mendirêjiyê
wekî nîşaneya xweştiviyê
wekî mirazê min î kemilî
di çavên xelqê de maye.

**14.08.2009, Bazîd**

**Zêmara Helbestvanekî**
*-ji bo xatirê 'Ceylan Onkolê-*

**I.**
Xezalê,
di binçenga te de zebeşekî Amedê,
di ber lêvên te ayetên Quranê
(ên ku ji meha remezanê mane),
û te rûyê balexaneyên bajêr şûşt
bi lûdoyên şivanan.

Hey bilbila li ser darê!
Ma te nizanibû:
Li vî welatî şêx û mela li ser postên xezalan nimêj dikin
û li cem wan meqama hera bilind postnişînî ye.
Lewre tu hatî gurandin li ber çavên cîhanê
digel çepikên kundan û fîqefîqa qijikan.
Hey dilovana ku tenê qijnî dipirçiqandin

da ku xwîna berxikên wê nemijin!
Ma te nizanibû:
Bûm xaniyan vala dikin ji şêniyan
û qijik çavan derdixin bi iştahekî bêpayan?

**II.**
Li kêrtê fêza mala we
revdeyekî guran hebû
û pêlîstokên MKEyê diyariyî zarokan dikirin.
Carekê çepilê birayekî te şikandibûn
da ku xwe ji gemarê tehfîr neke;
carekê jî canê birayekî te dabûn ber guleyan
û cendekê wî kiribûn bêjinga fîşengan.

Dema ku wêlewêla zêmaran kete hewşa bavê te
zarokên tirkan lîstikeke moxolî temaşe dikirin
li ser dika şanoya dewletê
û lewre bi herka Dicleyê nehesiyan.

**III.**
Her ziman li ser kuştina te axivî,
ji bilî zimanê tirkî.
Ji ber ku di vî zimanî de
dengdar û dengdêr di qirikên qebzbûyî de vedigerin kîteyan,
kîte bi peymanên nepen digihêjin hev,
heta ku serek îmze nekin ev kîte venagerin peyvan,
peyv ji bo armancên diyarkirî rêz dibin
û di hevokan de dicivin hev.
Ji ber ku di vî zimanî de
hevok û paragraf di merasimên fermî de watedar dibin
û her gotar ji bo bihaneyekê tê hûnan.

**IV.**
Îro naveroka dosyeya te ji raya giştî re hate aşkerakirin:
Li gorî otopsiya fermî
di hestiyên te de mîkrobeke azadiyê
û di nav goştê te yî hincirî de şarapnelên tirsê hebûne.

**V.**
Bi vê boneyê pênûsa min rê neda xwekuştinê

û ximava min bi riya çemê Muradê xwe gihande ser şînê.

*17.10.2009, Bazîd*

**Tarîban Aramî Ye li Welatê Yara Min**

Li welatê yara min
berî hilatina rojê dest pê dike jiyan,
karker xurînî diçin ser kar
û nîvê karên xwe berî taştiyê kuta dikin.
Dema ku xwendekar li berê rawestgehan dicivin
xijexija siwareyan guhên bajêr didirînin
û êdî dengê çivîkan dikeve ber sekeratê
piştî xebitandina makîneyan.

Li welatê yara min
giyan
piştî rofirînê tê bi bîra mirovan
û tarîban
bê def û zirne dadikeve kolanan.
Wê hingê tenê çîzeçîza çirçirkan tê bihîstin;
carinan himehima sermestekî xemgîn ji dûr ve,
carinan nîzenîza zarokekî viringî ji nêz ve.

Tarîban aramî ye li welatê yara min;
ne xew diherime bi teqîna guleyên serhildêran
ne xewn vedigerin kabûsan
û wê çaxê ramûsanên evîndaran
dikevin ber kefareta dengê çirçirkan.
Lewre şevê dev ji perisandina xaçepirsan berdidim
û di paşila yara xwe de
nakevim tatêla teperepa piyan.

*04.10.2009, Bazîd*

**Gava Neksa Te Biçike Nermînga Belegoşa Min Ramûse**

Navê welatê min ketm maye
û nehatiye qeydkirin li tomargeha niştimanan.
Lewre li mala xwe, li ser axa xwe û di welatê xwe de

wekî bêganeyekî digerim li kolanan.
Lewre di ber siya neyarekî û di bintîna bêbavekî de
işaretê didim mêşên hingivî
da ku raweşin sîngê makexwezayê
da ku vegerin digel puxteyê wizeyê.
Ne riya min bi Birca Belek dikeve,
ne jî beşdarî rêzecivînên Çarsim Axa, Qurqur Beg û Nêçoyê Spîxur dibim.
Min xurcika xwe ji bêriyên sedsalî dagirtiye,
şal û şapikên çarwerzî li xwe kirine,
dêlbijiyên kihêlê rewan hûnane
û ez dê werim.

Li bizavên ba û hewayê binêre:
Tu dê xiz û hêza min nas bikî.
Tevgera moristanan û rengê kevzehan bişopîne:
Tu dê ji rûgeha min piştrast bibî
ku hewalên cîhanê di tewereya min de rû didin.
Ez dê werim:
Stêrka bakurî di pêşnehtika kumê min î tel de,
di destekî de poşiya min a ji xwihdanê qilêrî,
û di destekî de jî şiva min a ji dara tûzikê.
Çawa ku ji hespê peya bim
ez dê te hilqefşînim di hembêza xwe de
û lingên te ji erdê raqetînim.
Hay jê hebe:
Gava neksa te biçike nermînga belegoşa min ramûse.

*06.12.2009, Bazîd*

**Pênc Danên Rojê**

Vê berbangê
dema ku helbest şiyar bibû
gurg ji dora gund û bajaran vekişiyabûn.
Hespekî şînboz bêhîrehîr qerpalên me dikişandin cilşokê
û parêzerekî berevaniya bextewariya me dikir
bi hesteke şîzofrenîk.

Vê sibehê
tavê da ser berf û pûgê

lê çima neheliya qerama zend û bendên me
û çima veneleziyan bazûyên me:
Tenê cerahê dilan dizane.

Nîvro ye;
solên me hetanî gêzikan şil bûne,´
şilpeşilpa piyan e li kolanê,
teqereqa bêran e û her kes berê mala xwe dimale.
Tu dibêjî qey werzeba dê bikeve erdê û biharek dê bê
wekî ku xwîna şehîdan zevînê şoreşekê av bide.

Berêvar e;
Qeram bi konetiya rovîyekî xwe dikişkişîne berbajaran,
dûyên sobeyan wekî duaya sitemdîtiyekî qulozî esmanê lacwerdî dibin
û zarokên xizanan bi miqarneyeke kelezûrî haziriya xewê dikin.

Şev e, şevereş e;
Zûrezûra keftaran zêmarên dayikan tînin bîra serhildêran,
berqefên şkeftan şerm dikin
û ji şerman gujeguja bayê çolê vedişêrin.

Pênc danên rojê
kesera te hevalî
wekî cixareyeke tehl di ber taqa kumê min de:
Dikim bikşînim, lê nikarim ji ber hilhilka xebatê,
dikim bavêjim, lê heyfa min pê tê.
Min bibexşîne ku hevaltiya me dişibihînim kêşa cixareyekê.
Ma di wê bahozê de bafirok dihatin firandin,
ma di wê aloziyê de diyan zarok dimêjandin:
Heta ku min jî hevaltiya me bişibihanda xîreta Şehrazadê
û ji kujerê hevnijadên xwe re çîrokên hezar û yek şevî bixwendana?

*07.02.2010, Bazîd*

## Wêneyên Çar Zindanên Xerîbiyê

**I.**

Hêviyên me hov in, hespên me kedîkirî;
Giramiya me ji bo hesinkaran e
û şehîdên me bêdestnimêj li mizgeftan digerin.

Me cîhan li xwe kiriye zindan
da ku zindan li cîhanê nemînin.

**II.**
Simbêlên me dadiliqin ser bilûrên me,
şûtikên me ji bendesolên me berktir girêdayî ne;
diyar e ku em dê li beravekê rawestin
û ramanên xwe tehfîr bikin
bêyî ku navnîşana Mala Xwedê jê bişon.

**III.**
Civakek serdanpê nakeve xewê,
fîtefîta bayekî hênik e helbest
û helbestvan piştî nobedaran radizin:
Pir caran balîfê wan pênûsek
û nivîna wan kaxezek e.

**IV.**
Maka tarîbanê şevereş e;
hey Xwedê dizane çend reşên şevê di newalên wê re derbas bûne
û hey Xwedê dizane çend dizî di paşila wê de felsefeya xwe hûnaye.
Ronahî bêtirs li ser banan digere:
Êdî wênekêşî dijwar e,
tîrêjên tavê wekî destîtevrekî eniya mirovî dikutin
û dem ew dem e ku xwe bavêjî ber siya darekê.

*08.03.2010, Elbeyda/Libya*

**Bi Gulekê Bihar Tê**
*-ji bo Silêman Çevîk-*

Te bawer nedikir;
lê qanûna surişte ev e:
Ev qeşa dê biheliya,
dê serî hilda beybûnekê tenê,
xortan dê newroz bigindirandana havînê
û mirarê koviyan dê biba şîva gurg û keftaran.

Ez dê bi coşa biharê werim havînê
û bêhna xwihdana min berateya kedekê ye.

Qirika min ziwa bibe jî
ez dê tifî devê cûcikên kevokan bikim.
Heke rehm li ber dilê min tunebûya
min dê ew hêk bidiziyana ji mêkewê,
berî ku di binçenga min de bişêlin.

Niha ji te dûr im.
Heke biqîrim dengê min nabihîzî,
heke pişta xwe bispêrim wêraneyên pêşiyan
dê çimeke dîrokê biqelişe;
lê tu ji bo min bêhtir ezîz î.

Rûmeteke peyvê heye:
Hem beriya ku bahozên faşîzan rabin
hem jî piştî ku alayên zilmê dakevin.
Metirse! Bahoz ji şkeftên wijdanê nagirin.
Her wiha bihar bi gulekê hat
û min hemû gunehên te vajî kirin.

*09.05.2010, Elbeyda/Libya*

**Ji Biyanistanê Çend Çarîn**

Tu bidî xatirê wan tizbiyan:
Ew tizbiyên ji poz û guhan.
Carekê be jî li rûyê min binêrî
da ku ji peratê re bibe derman.

Tu bidî xatirê serên jêkirî:
Serên bi kindiran darvekirî.
Carekê tifî navçava min kî
pê derxim çima pîroz e girî.

Tu bidî xatirê wan rehekan:
Rehekên ku bûne rehîna agiran.
Carekê delavê Firatê berdî
da ku piçekê şil be korewijdan.

Tu bidî xatirê keçên sihirandî
û zêmarên li ser goran nehwirandî.

Carekê ji devê xwe bişehitînî
Wê peyva ku mirinê dike zindî.

*14.06.2010, Elbeyda/Libya*

**Tirsê! Pêsîra Min Berde!**
*-ji bo Henîfiyê Hecî Şero-*

Temenê min bi qasî jînenîgariya mirovahiyê dirêj e:
Beriya ku Quran bê hinartin
min helbest dixwendin li bazara Uqazê
û dema ku Talût winda bû
di nav rûpelên Talmûdê de
min mezmûrên Zebûrê dinehwirandin

Paniyên min qeli_şî ne:
ji dûreriyên dereke vedigerim,
ji devdelingên min bêhna cehtera biyanî difûre
û kefzehên zeryayî
di nav pirça qefesa min de kesk dibiriqin.
Di binebêrîkên min de
xiştexişta kakilên behîvan e:
Heke di taxê de hê zarokên negurandî mabin, para wan e;
lê bawerim ku dewr dewra firewnan e li Meydana Tehrîrê
û ji devhuçikên min sinbil dadiweş_in beravên Nîlê.
Li bîranînên xwe diramim û noqî dîroka evînê dibim;
lê kiloxên Dêra Qiyametê radiweşin çolistana Sînayê
û Evîna Tahir Begê dide dû xirdikekî biyanî.
(Li gorî gotinên gotindaran ji bilî Şaşoyê Pîrê
hevalên min gişt di dîlana wê de direqisin.
Xwedê hifza mirovî bike,
gayê malê biçe cot
û gavan ji conegayê xelqê re gijogijo bike.)

Kifş e, hê di şevereşa dilê min de hîv hiltên
û di kelekela vê xiyanetê de ewr min hembêz dikin.
Bes e, min zimanê xwe gez kir ji kerban
Bes e, serçiçikên peyvan pişirîn bêxwedan.
Tirsê! Pêsîra min berde!
Hemû rê bi zorê vedibin

û şkeft têk dibin meclisan.

*06.07.2010, Elbeyda/Libya*

**Tenêtî jî tenê dimîne!**

**I.**
Dema ku jin û jinkok ji hev vediqetin,
mêr û mêrkok hev gulebaran dikin,
derew çarşevan li xwe dikin
...û rastî rût-tazî berê xwe dide lehiyên deryayê
tu têyî bi bîra min.

Tu têyî bi bîra min;
lê nikarim xwe bigihînim te.
Di nava wê qiyameta mirovan de tenê me;
lê bêrî û hêvî bedena min a sar vedipêçin,
pê dihesim ku min tenêtî tenê hiştiye
û li te digerim.

**II.**
Li te digerim, tu ne di paşila qehbikekê de yî;
li te digerim, tu ne li ser maseyeke meyxaneyekê yî;
li te digerim, tu ne civateke mêrkujan de yî.
Wêneyê te di manşetekê de ye,
li pêş û pey navê te kelîmene kirêt hene.
Dema ku leşkerekî biyanî tifî wî wêneyî dike
û paşê jî pêpest dike
pê dihesim ku tu pêşengekî gelê min î;
pê dihesim ku tenêtî jî tenê dimîne.

*08.07.2010, El-Beyda/Libya*

## Qiblename

Di navenda dilê min de tu heyî
û êdî ji qeyranan natirsim.

**I.**
Li rojhilatê dilê min berbang e.
Di esmanekî tehfîrkirî de Hecî Qurbanê Silêmanî
Destana Cecoxanî vedibêje
û Kawis Axayê Milanî serpêhatiya Simkoyê Şikakî.

Pa_şê taveke havînê xwe berdide _şaxên dilê min
û tîrêjên germ digihêjin gorên komî.
Di kelekela vê havînê de
li siya rastiyekê digerin çavên min.
Hêviyên min di dilqê şêresiwarekî de dadiliqin xewna Ejdehayî
û Kawa pifî êtûna dîrokê dike li Kirmaşanê.

**II.**
Li rojavayê dilê min ş_evere_ş e.
Zarok hişkehişk dayikên xwe hembêz dikin
û findên derewçînan dadimirin
ji ber heybeta te
ango ji ber nûçeyên hilatina rojê.

**III.**
Li bakurê dilê min qeşa heliyaye,
mêşên hingivî raweşiyane Zozanên Elegezê
û bilûra şivanekî kurd
straneke Şedadiyan dilorîne.

**IV.**
Li ba_şûrê dilê min bêdengiyek serdest e
û hemû zarok raçaviya kalekî temendirêj dikin
da ku digel çîrokan xilmaşî jiyaneke efsûnî bibin.

*29.07.2011, Bazîd*

**Cejnek Wiha Bihurî**

*-ji bo heval û hogirên li biyanistanê-*

Ka ew cejnên berê?
Berê kirtekirta çarixên me
nasnameya me diyar dikir.
Berê hebûna me
qurbana hebûna xelqê bû.
Zimanê me yî çiyayî jî
colek ji zimanên der û dorê bû.

Lê ev cejnên niha?
Niha otopsiya hestiyên pakrewanan

nexş_eya giyanê hov û koviyan xêz kir.
Niha hebûna me
ne rehînê kêfxweşiya xelqê ye.
Zimanê me yî deştî jî
bi tîpa /t/yê hesiya.
Lewre peyvên wekî “tirk, tehcîr, tenkîl û texrîb”ê
ji nû ve hatin şîrovekirin.

Cejnek bêyî pîrozbahiyê bihurî,
dewraneke pederşahiyê guherî
û _şamanîzma serqot
di dilqê taxûtekî sergirtî de vegerî.
Ne hukmê meh û şahiya pîroz pere kir
ne jî kêzmê zilmê xwîna te sar kir.
Êdî peyva “xwezila” ji ferhenga berxwedanê ketiye;
lewre çavekî min li naveroka peyva “viyan”ê
û yê din jî li wateya peyva “jiyan”ê gerî.

Li fêza Babîlê, li warê baxçeyên daliqandî
li ser wê pireya wekî marekî di kovelanê
siwareyek hate bombekirin û encam:
Solîneke sotandî, malbateke qurçimandî,
tetqal tetqal xwîn, mertal mertal berxwedan...
Di wê şevereşê de
em li taca ronahiyê geriyan
û ji Wanê brûskekê riya me ronî kir.
Belê, ev cejna pîroz a bêpîrozbahî
di lisfê şîneke neteweyî de bihurî.

*03.09.2011, Bazîd*

**Bersiva Rast Hilbijêre**

Xwîna kurdan yek e
û jimareya yekê tenê li yekê tê parvekirin.
Welatê kurdan çend parçe ye
û çima jimareya yekê
bi destî hûrjimareyan hatiye parçekirin?

**A.**
Dilê te qadeke parastî ye.
Ne sima hespekî teterî lê ketiye
ne jî bi lavija ş_amanekî Gok Tengrî lewitiye.

**B.**
Çavên te mîrkutê dadwerekî ne.
Di bin piyên te de maf napirçiqin
û bi hildana navê te diz vediciniqin.

**C.**
Yek bi pirjimareyan hatiye parçekirin
û bi vî awayî hûrjimare derketine holê.
Welat bi darê zorê hatiye parçekirin
û zordaran desthilatî radestî hev kirine
wekî ku seg bi dorvegerî hilperikîne dêleke tele.

**D.**
Xwîna nemerdan li erdê dimîne,
alaya sitemkaran dibe pîne
û ayîka bizina kol ji ya biqiloç re namîne.

**E.**
Mirovê mafdar bi berteka xwe çekdar e jî.

***Nîşeya xwediyê pirsê:***

1. Keda gelekî bi şîfreyan nayê çilfisandin.
2. Makurk li ser hêkên genî nayê melisandin.
3. Zûrezûra gurekî bi olana fîşengekê tê tepisandin.
4. Çeleçela belhaman mûsayekî nade tirsandin.

*Belham Ben Bahura: Haxamekî cihû bûye û dema Cn. Mûsa eleyhîselam amadehiya şerê Hukimdarê Filistînê dike, hukimdar jî gefan li Belhamî dixwe û alîkariya wî dixwaze. Li ser wê yekê Belham bi navên Xwedê yên herî pîroz nifiran li Cn. Mûsa eleyhîselamî dike ku dev ji vê niyêta xwe berde. Birastî jî artêşa pêxemberê Xwedê nikare têkeve Filistînê û piştî Cn. Mûsa eleyhîselamî pêxemberekî din ê bi navê Yûşa eleyhîselam Filistînê feth dike. Lewre ev nekes di Quranê de wekî kûçikê ku dike hilehil û zimanê xwe dadiliqîne hatiye tarîfkirin. Êdî navê wî*

*bûye nîşenaye oldarên ku zanyariyên xwe dikin xizmeta zilmê."*

**Êdî Pisîkeke Te Jî Heye, De Bigirî!**

*-ji bo xwendevanekî bi nasnavê Seydo-*

**1. Profîla Rojanekirî**

Te bi salan nivîsî,
gelek ciwanan
nivîsên te wekî niviştan avêtin stûyên xwe
û ber bi penagehên SSê meşiyan;
lêbelê dengê te bi qasî simbêlên te zirav bû.
Lewre axayê te ji te hez kir
û sifreyeke têrtijî raxiste ber te.
Noşîcan ji te re!
Noşîcan ji axayê te re!

Fermandarê Bermûdayê destê xwe li pişta te xist
û toza sî salên tarawgehê daweşand.
Berdevkê wî yê siyasî jî sipasiya te kir
û kartên aferînê li ser te de bariyan.
Lewre krediya axaftina te hate dirêjkirin
li ser hesabê gelê Dêrsimê.

**2. Çalakiya Dawîn**

Rêhevalê te yê bi navê Yilmazê Şame
Destana Agiriyê nivîsî û karwanek bi rê xist.
Lewre tu yê derbasî rojhilatê Firat û Dicleyê nebî
da ku qîrçeqîrça çekên serhildêran neyê tomarkirin
û qirçeqirça hestiyên li Geliyê Zîlanê nekeve raporên CPTyê.

Tu li cem axayê xwe rûne.
Em ê ji te re pisîkeke Wanê ya yekçavî bişînin
li ber rîtma yekala, yeknetewe û yekwelatî.
Bila mirazê te di çavên te de nemîne.
Em ê ji bo xatirê te çavekî wê jî kor bikin;
lê em matmayî ne û nizanin
bê ka em ê kîjan çavî birijînin:
Em çavê hêşîn bipijiqînin baş e an çavê kesk?

Bila haya te jê hebe ku hêşîn rengê esmên e,
kesk jî rengê daristanê ye
û dilê me di ber dernakeve,
destên me naçin her du rengan jî.
De êdî tu biryarê bide
an jî wekî her carê
mafê biryardanê bispêre şagirtê Eliyê Kîmyewî.

**3. Pêşniyara Xwendevanekî**

Di vî temenî de
bila êdî pisîkeke te jî hebe.
Bi wê ajaloka xwe here serdana şêrên girtî
û kişkişî wan bike.
Paşê vegere xanmanê xwe yê lawan
û xwe amadeyî bernameyeke TRT6ê bike.
Ne bila dengê Seyadê Şame were guhên te
ne jî stranên wî yên li ser Biroyê Hesikê û lehengên bênav.
Pirtûka Yilmazê rêhevalê xwe jî
virvirkî biavêje goreke komî an jî çaleke asîdê
û bila ji ber çavên dîrokê biheyibe.
Rola xwe baş bilîze ha:
Ji koçbereke selpakfiroş destmalekê bikire
û derkeve ber kamerayan.
Jixwe êdî pisîkeke te jî heye, de bigirî!
Pê bikute erdê
û rik bikute kedê!
Ji te re serkeftin serbaro!

*11.08.2011, Bazîd*

**Roboskî: Sersala Kurdan**

**I. Du Roj Beriya Mîlada Roboskiyê**

Bavê me yê Adem
û diya me ya Hewa
bi girî daketin rûkala cîhanê.
Her wiha her yekî me bi girî çavê xwe vekir
li ser rûkala vê cîhana berhewa.

Rojê çendîn zarok bi girî tên cîhanê
û çendîn zar û zêç bi girî vedilezin goreke siksar
tevî giriyê hezkirî û dostan.

Lê,
lêbelê,
li Nîşantaşiyê, çend saet beriya komkujiya Roboskiyê
mirov ji kêfan dibehecîn,
hemû mey û araqên giranbiha komî meydanê dikirin
bi qasî gilêza segekî erzan bû xwîna kurdan.
Her kesî dê bixwara, vexwara û hoynarê bilîsta
û li welatê min jî,
balafireke leşkerî ya romiyan li birayekî min xist
na ... ne balafirek, çend balafiran
balafirên bêmirov ...
nemirovên bêbalafir ...
na na dêwan, ûcan, qeretûyên şevê, reşên şevê, barçêmkan, kundan, pepûkan, gurê manco, marê heftserî gişt hevpeyman bûn
li xortan, li mirovên navsere
li zarokan, li xwendekarên dibistanan xistin.

**II. Sê Roj Pîştî Mîlada Roboskiyê**

Cîhan bêdeng e, her kesî nefesa xwe girtiye
komeke sermestên meydanê berepaş dijmêrin:
neh, heşt, heft, şeş, pênc, çar, sisê, didu, yek!
da ku ji bîr bikin
da ku bidin jibîrkirin
ku berî sê rojan
komeke derdestên qeyranê li girê Roboskiyê civiyan,
bertîl dane qantirên dupê
da ku qantirên xwe yên çarpê derbas bikin
ji çeperên zilmê, rêbiriyê, telaqreşiyê ...
lê,
lêbelê balafirên bêmirov
ji nemirovên bêbalafir re peyamê ragihandin
û wan jî ferman da:
34 mirov mirin, yek rizgar bû ...

### III. Salek Pîştî Mîlada Roboskiyê

Cîhan dîsa bêdeng e,
axayê lepqirêj di keleha Gurgumê de rûniştiye
dîwan daniye,
nekes gişt li wir in
û ba li ber devê yekî ketiye ...
Her tişt amade ye:
Meleno huş bin, piştî çend rojan sersala me ye,
hûn dizanin ku baca meyxane û kerxaneyan
a ku hûn qaşo jê aciz in, digazinin
miaşê we ye.
Serbazno aşt bin,
piştî çend rojan salvegera kuştina "wan" e
kuştina her kurdî paye û rayeya we ye.

**Nîşe:**
Ev helbest
di sala yekem a piştî mîlada Roboskiyê de hatiye nivîsandin.
Sersala xelqê bi kêf û şahî ye
û ya me jî bi şîn û girî ye.
1. Hêviya me ji belhaman nemaye,
2. Sûra rehmê di dilê Haman de nemaye,
3. Firewn bi waezên Mûsa dipeyive,
4. Mûsa li welatê Medan perwerde dibe.
5. Noşîcan cîhan, noşîcan!
Bixwin, vexwin, vegevizin ...
Sersala me kurdan pîroz be!
Û sersala we neyarên mirovahiyê jî
wekî nexweşiya bavê we "sîroz" be!

*25.12.2012, Bazîd*

**Ji bo zarokan serê şevê helbestek**

**1. Meleyê Zimandirêj**

Hebû di heyama Mûsa eleyhîselamî de mirovek
Bi navê Belamê kurê Baûra hebû zanayek.

Ew alimekî pir gewre bû, ji Xwedê dıtirsiya

Tewrat dizanibû her kesî jê fetwayek dipirsiya.

Bi hezaran xwendekar dihatin dîwana wî
Bi hezaran kesî emel dikir li gor gotina wî.

Her kesî jê hez dikir, şîreta wî guhdarî dikir
Di nav gel de ew teberik bû, baş bawer dikir.

Rojekê Mûsayî xwest Filestanê dagir bike
Kenaniyan tika jê kirin da ku nifiran lê bike.

Belamî got: "Ez nikarim ji bo we tiştekî bikim
Quweta min tuneye li hember wî, ez kesek im."

Gotin: "Lê tu alimekî mezin î, ji bo me dua bike
Duayên te diqebilin, qe nebe li wan nifiran bike."

Belamî got: "Mala we here devê kulê, ew pêxember e
Bawermend û milyaket pê re hene, gotin ji aqilan der e."

Lê kenaniyan lava kirin, dawiyê ew iqna kirin
Wî jî nifir kir, bi vî awayî îmana wî betal kirin.

Bes nifir vegeriya serkeftinê ji bo artêşa Mûsa
Kenaniyan gef lê xwarin da ku çareyekî bibîne dîsa.

Gotin: "Bila welatê me li ber xelqê peymale nebe
Tu carî li ser xaka me bila biyanî desthilat nebe."

Wî jî ev rê nîşan da û got: "Gava cihû
gunehan bikin ew ê mexlûb bibin zû."

Belamî jinên bedew şandin nava artêşê
Exlaqê wan guherand ew bûn koleyên fuhşê

Bi vî awayî artêşa Mûsayî neket bajêr bi hîleya Belamî
Lewre Xwedê ew şibihand kûçikekî zimanê xwe daliqandî.

Dawî hat li çîroka me, rehmet li gora dê û bavê guhdaran
Me ne bike Belam ne jî me bike tevî arêşa gunehkaran.
*27.12.2012, Bazîd*

**2. Zengînê Qure**

Hebû demek ji demên berê zengînek
Bi navê Qarûn tê naskirin qureyek.

Li gorî hinek riwayet û salixên mehkem
Ew kurap bûye ji bo Mûsa eleyhiselam.

Gencîneyên wî ewqasî cur bi cur bûn
Dewsa kilîtên wan tenê jûr bi jûr bûn.

Dema Mûsa ji bo teblîxkirinê hate ba Firewn
Gote wan: “Bawer bikin, bila şên bibe kewn”.

Wî piştgirî neda kurapê xwe yê Mûsa
Ji bo malê cîhanê kurap firot, bû riswa.

Beşdarî civata Firewnî bû, digel wan biryar da:
“Lawên cihûyan bikujin, jinan berdin qada.”

Wî gelê xwe û kurapê xwe teslîmî şûr kir
Bû piştevanê zilmê, mal û milk berhev kir.

Her kesî dilê xwe dibijande hebûn û serweta wî
Qet kesî nizanibû gelo dê çawa be axireta wî.

Dema hinekan digot: “Li xizanan bê rehmê
Sedeqe û xêrê bide, bila tu neçî cehenemê.”

Wî bi quretiyeke sosret bersiv dida wan û digot:
“Ev mal bi zanatiya min ketiye destê min”, bi fort.

Ev qurebûna wî pir giran hat li ba Xwedê
Ew xaniyê wî tev şandin çend tebeqe binê erdê.

Li gorî riwayetan ew hê jî di erdê de diçe xwarê
Da ku bibe ibret Xwedê ew nimûne aniye ser zarê.

Îro jî çîroka me li vir qediya, sed sipas ji bo guhdaran
Xwedê ne wî malî bide me, ne jî wekî wî têke axesaran.
*28.12.2012, Bazîd*

**3. Fermandarê Stemkar**

Heyamên berê hebû kizîrek gelekî stemkar
Navê wî Haman bû, ji Firewnê Misirê re alîkar.

Xwedê Mûsa û Harûn şandin bi ayet û peyaman
Da ku Firewn û desteya wî ya zalim bibin misilman.

Lê Firewnî got: "Xwedayê we ez im, Hamano rabe
Bircekê ava ke, dibe ku Xwedayê wan tê de xuya be."

Haman fermandarekî zalim bû, ferman dida qetliyaman
Lawên cihûyan dikuştin, jinên wan serbest berdidan.

Lewre diya Mûsayî ew kir selikekê di ro de berda
Jina Firewnî derkete ber Nîlê, Mûsa dît û ew hilda.

Firewn û Haman Mûsa bi destên xwe xwedî kirin
Bi rastî wan tolhildêrê cihûyan perwerde kirin.

Zilma wan gihişt erşê esmên, Xwedê li wan hat xezebê
Mûsa kir pêxember da ku li wan bişewitîne kezebê.

Haman pir qure û erah bû, gef li Mûsayî dixwar
Lê Mûsa wêrek bû, li ber wî tu carê danedixwar.

Çiqas karên telaqreşiyê hebûna Hamanî dikirin
Hêz û ewlehiya berjewendiyên xwe mehkem dikirin.

Roja ku Mûsa reviya ji Misirê, Hamanî ew dişopand
Xwedê Hamanê zalim di ava çemê Nîlê de xeniqand.

Zilm û tevgera wî bû nîşaneya şelaqî û stemkariyê
Aqubet û dawiya wî jî bû encama wê gunehkariyê.

Xwedê tu bendeyî neke ber lep û pencê Hamanan
Me giştan biparêze ji pergal û desteya Firewnan.

Bi kurtasî çîroka me ya îro jî wiha dawî lê hat
Rehme li dê û bavê guhdaran ku êdî xewa wan hat.
*29.12.2012, Bazîd*

**4. Pîşekarê Sextekar**

Hebû di heyama Mûsa eleyhîselamî de mirovek
Navê wî Samirî bû, dihat naskirin wek pîşekarek.

Xwedê cihû ji misriyan xelas kirin, li çolistanê

Wan pûtparêz nas kirin nêzikî erdê Filestanê.

Ji Pêxember Mûsayî re gotin: “Ji me re çêke
Pûtên mînanî pûtên wan, ew çi xweş riyek e.”

Mûsayî got: “Xwedê hûn rizgar kirin ji Firewnî
Çawa hûn vê nankoriya han dixwazin bi hêsanî.”

Paşê roja civanê hat, Mûsa derket Çiyayê Sînayê
Harûnê bira kir cîgir da ku gel jê wergire mifayê.

Piştî çûyîna wî Samiriyî dest bi pîşeyê xwe kir
Zêr û zeberê gel berhev kir, jê golikek çêkir.

Paşê gazî wan kir û got: “Ev Xwedayê Mûsayî ye”
Harûnî ew derewandin û got: “Ev çi riswayî ye?”

Cihûyan gef li wî xwarin da ku dengê xwe neke
Harûn sekinî ta ku Mûsa were û mijarê çareser ke.

Mûsa ji çiyê vegeriya, li ba wî lewhên wehiyê
Lê hîn bû ku gelê wî dageriyaye ji riya heqiyê.

Gelê wî xwe parast: “Me ji Misirê gelek zêr anîbûn
Samiriyî golik çêkir, em gişt li benda biryara te bûn.”

Mûsayî bihêrs got: “Harûno te çima destûr da wan?”
Harûnî bersiv da: “Gefa kuştinê li min xwarin giştan.”

Mûsayî berê xwe da Samiriyî û ew darizand
Ji bo ku dadwerî pêk were ew li hafê axivand.

Samiriyî got: “Min ax hilda ji şûnpiya milyaketî
Avêt nava zêrê helandî, kêfa min bi hunerê hatî.”

Mûsayî biryar da ku heta mirinê têkiliyan bibire
Ji mirovan dûr bikeve, ji kerb û xeman bimire.

Pêxemberî golikê zêrîn bihujand û avête rûbarî
Cihûyan jî hev kuştin, xezeb bi ser wan de barî.

Paşê Mûsayî lewh hildan, dîsa gazî dînê Xwedê kir
Sed sipasî ji bo we ku çîroka vê şevê guhdarî kir.
*30.12.2012, Bazîd*

**5. Xwefiroşê Gorbigor**

Sala ku Cn. Muhemmed eleyhîselam hate cîhanê
Mirovek dijiya bi navê Ebû Rixal li aliyê Yemenê.

Mîrê hebeşiyan li Yemenê dêreke gewre ava kiribû
Guherandina qibleya ereban ji dil û can nêt kiribû.

Erebekî gundî çû Yemenê û di dêra wî de mîst
Mîrê hebeşiyan ev bûyer ji sîxurên xwe bihîst.

Biryar da ku here heta Mekeyê, hilweşîne Ke'beyê
Da ku ereb werin dêra wî, berên xwe bidin Sen'ayê.

Kesî nedixwest di çolistanê de bibe rehberê wî
Mala Xwedê birûxîne, bibe hevparê gunehê wî.

Lêbelê Ebreheyê mîrê hebeşiyan biryar dabû
Da ku nêta xwe hasil bike artêşek meşandibû.

Nekesê bi navê Ebû Rixal jê re rehberî kir
Di çolistanê de kurteriya çûyînê nîşan kir.

Dema teyrên Ebabîl kevir barandin ser artêşê
Hinek li wê çolê mirin, hinek paşê mirin bi êşê.

Lê ew berî dagirkirinê mir, çal kirin li wê derê
Kîjan ereb rabû, nifir lê kir û got: "Gû li gorê."

Bi vî awayî Ebû Rixal bû nîşaneya xwefiroşiyê
Ereban gora wî ricim kir, ji ber tevgera nebaşiyê.

Di nav ereban de kî gelê xwe bifroşe ji bo kara xwe
Navê wî datînin Ebû Rixal ji bo parastina hêza xwe.

Îro jî wek her carê dawî li çîroka me hat gelî guhdaran
Rehme li dê û bavê we nebin kaşoyê destê neyaran.
*31.12.2012, Bazîd*

**6. Rûmeta Baweriyê**

Di sedsala şeşan de dijiya mirovekî zehf qenc
Bi navê Fêmyon, li gundekî Şamê dikir qezenc.

Bawermend bû ew, lê baweriya xwe vedişart
Xwe ji nebaşiyê diparast, her tim rastî dibijart.

Lê ji vî gundî kesek bi baweriya wî hesiya
Ew dişopand ji dûr ve, dema derketa biçûya.

Fêmyon li çolê nimêj dikir hatê ejdehayek
Mêrikî kir qêrîn: “Filankeso hate te ziyayek.”

Wî nimêja xwe neterikand, ziyayî lê nexist
Dît ku qencekî Xwedê ye, mêrikî tê derxist.

Kor diçû ba wî, bi duaya wî çavsax dibû
Kê zilm li bikira holî rewşeke kambax dibû.

Li Hicaza ereban talangeran Fêmyon girtin
Ew kirin kole, li bazara kolefiroşan firotin.

Torinekî Fêmyon kirî, ew hilda û bir mala xwe
Lê wekî berê êvaran ew radibû ser nimêja xwe.

Gava radibû ser nimêjê nûrekê mal ronî dikir
Wî roj bi roj baweriya xwe li Necranê belav dikir.

Lê mîrê ereban nedixwest ku pûtparêziyê bihêle
Ji ber ku peyama filehiyê hatibû bi destê yekî kole.

Hemû gelê Necranê kom kirin da ku înkar bikin
Wan dînê xwe berneda û gotin: “Çi dikin bikin!”

Li ser vê yekê cihokên kûr hatin kolandin
File gişt kuştin û ew ber bi jêr gindirandin.

Ji bo yadgarê Xwedê navê wan derbas kir Quranê
Da ku duristiya wan bibe nimûne ji bo ehlê îmanê.

Îro jî çîroka bûyereke dilsoj hat û gihişt dawiyê
Rehme li dê û bavê we ku hûn hatin guhdariyê.
*01.01.2013, Bazîd*

**7. Nifira Dayîkê**

Di nav Benû Îsraîlê de mirovek hebûye

Bi navê Cureyc zanayekî taetkar hebûye.

Rojek ji rojan ew li ser nimêjê li piyan bûye
Diya wî tê hindê, gazî dikê; lê ew dudil bûye.

Cureyc ji xwe re dibêje: “Gelo bersivê bidimê
Yan nimêja xwe biqedînim û paşê ber bi herimê.”

Diya wî bêtab bûye û wiha nifir lê kiriye:
“Xwedayo, kurê min bêemriya min kiriye.

Heta ku Tu rûyê matoşqeyan lê nîşan nedî
Li ser rûyê cîhanê ruhê wî ji bedenê hilnedî.”

Di demeke ku Cureyc di perestgeha xwe de ye
Jinek xwe pêşkêşî wî dike, lê ne ew bi dilê wê ye.

Ev jin jî diçe cem şivanekî, wî digihîne xwe
Zarokekî jê peyde dike û dibêje malbata xwe:

“Zarok ji Cureycî ye, li ku be herin, wî bibînin”
Xizmên wê tên hindê û perestgeha wî dirûxînin.

Her wiha Cureycî jê derdixînin, navê wî sox dikin
Lê ew destnimêj digire, nimêj dike da ku qanî bibin.

Tê hinda zarokî û dibêjê: “Lawiko bavê te kî ye?”
Zarok dibêje: “Şivan e, ma hûn nizanin ew kî ye?”

Xizmên jinikê û gelê doraliyê gelekî poşman dibin
Dibêjin: “Em ê perestgeha te bi zêrî ji nû ava bikin.”

Lêbelê Cureyc mirovekî zana û dilnizm bûye
Pêwistiya wî bi mal û milkê cîhanê tunebûye.

Lewre dibêje: “Nexêr, tenê ji heriya sax bijenin”
Hûn dibînin çi ecêb li ser rûkalê cîhanê henin.

Ev çîrok di hedîsekê de dibihure û min jî hûna
Bi zimanê helbestê, da ku zarok pê dilxweş bibûna.

Vê care jî dawiyê didim vegotina çîroka xwe
Lê rojeke din ez ê bi yekê derkevim pêşberî we.

Rehme li dê û bavê guhdaran ku xwendin çîrok
Hêvîdar im beremrê dê û bavên xwe bin hemû zarok.
*06.01.2013, Bazîd*

## Sara: Kulîlka Berî Biharê

*-ji bo Sara û rêhevalên wê-*

Şeva din
dengê te hate nixumandin
û tifa te li rûyekî ma.
Li kolaneke sereke
guleyek di eniya Parîsê de teqandin
û têkoşîna te li qefa çiyayekî ma.

Bihar bi gulekî tê Sara
heke bê qurçimandin jî.
Ew nîşaneyek e,
hêmayek e ew Sara
heke bê pirçiqandin jî.

Wekî ku tifa te bû lehî
û sikir rûxandin
wekî ku vîna te bû pola
û sîxur li ber xwe tewandin
teqez bihar dê were
bi te kulîlkê
yan jî bêyî te kulîlka qurçimandî.

*11.01.2013, Bazîd*

## Xebat Li Ber Finda Hêviyê

Îro têgihiştim ku:
Mala min ji şûşeyê ye hevalo,
û dilê min ji kaxeza kûşeyê.
Lewre mala kesî kevirbaran nakim
û nivîsên erzan li ser kaxeza dilê xwe çap nakim.

Îro têgihiştim ku:
Divê mala xwe biguhêzim xaniyekî kevirîn delalo,
û dilê xwe veguhêzim birceke kunkunî

da ku kevokên bêzar û bêziman
tê de hêlînên xwe çêkin dûredest.

Lê îro têneghihiştim bê çima
her kesî para xwe hilda ji pakêtên diyariyan
û zarokên kurdan bêpar man, tiliyên xwe mêtin?

Dibe ku pêwist e dergehê ictihadê bigirim
ji teraliyê re, ji bihaneyê re
û dîsa vegerim xebatê li ber finda hêviyê,
bêdopîng derkevim ser dika serkeftinê;
bê zarî û girîn hilkişim hêsiya[1] dunê.

*30.09.13, Bazîd*

**Şert Û Mercên Helbestvanekî**

Min navê te neqişand li qefa her wijdanê
Wêneyê te dewisand li taqa her cuzdanê

Min ariya kezeba xwe ya şewitî danî kildanka te
Te qîma xwe pê neanî, go: dilê te yê evîndar kanê?

Min dilê xwe raxiste ber te, tu li xwe geriyayî
Ger nebînî navê xwe, ditirsim lê rawestînî jiyanê

Heke navê te bikim mora li eniya her niviştê
Wê hingê gelo tu yê min ramûsî Kurdistanê?

*22.11.2013, Agirî*

**KOBANÎ: Çirûska Gelê Şoreşvan**

**I. Kurtedîrok**

Sala 1912an
şirketeke almanî
li ser zikê Heyvika Pîroz
kargeheke rêsaziyê ava kir.
Dagirkerên rojavayî

û hevalbendên wan ên osmanî
jê re digotin “company/kompanî”.
Li gorî gotina gotindaran
dê riyeke hesînî ava bikira;
Konya û Bexda bi hev ve bikira
li ser hesabê kurdan
û ji bo berjewendiya mêtingeran.

Roj geriya, dewr û dewran jî.
Ew beşa welatê min bû “rojava”
û ew şirket vegeriya bajarê Kobanî.

**II. Pêvajo**

Welatên rojavayî
duh li rojavayê welatê min bûn;
konê kampanyayekê vegirtibûn;
çîrçîrî kiribûn mirovahî;
ji çermê mirovan nexşeyek
û ji qaqotkên seriyan
sînorek li dorê danîbûn.
Ev çendî çend sal bûn,
(ku) kurdan û Kurdistanê
wekî kurmoriyên morîstanê
dora singên konê kampanyayê girtibûn;
bi sebra pêxemberan dixebitîn
û bajar rizgar kiribûn.
Lê mîratxurên Auschwitzê aciz bibûn;
li ser rikî kurdan
keriyekî cehşan li hawirdorê girêdabûn.
Paşê mîratxurên Tîmûçînê tatarî hatin;
hesp û hêstirên xwe li deverê bêhefsar berdan.
Lewre çarmedora Kobaniyê
bûye garana ker, hesp û hêstiran.
Mixabin çi tê
tê serê çêreya welatê min.
Çi tê,
tê serê Rezên Babîlê.
Çeperên bajêr ketine ezmûnê;
bi bandora zîtikan

xîretkêş ji xewê radibin
û bersivê didin pirsên mirovahiyê.
Garan li ser wê xaka pîroz digevize
û mirovahî li ber ekranan, bêwijdan ditevize.

**III. Rojev: Çirûska Gelê Şoreşvan**

Hey gelê mino!
Hey Kobanî,
tu dê nebî qurbanî!
Hey Ristemê kurê Zal!
Bavê te
tu avêtiyî Çiyayê Kurmênc
û teyrekî sîmorx tu parastiyî.
Êdî girmegirma çakûçan e
û hesinkar gurzê te diafirînin.
Xijexija pênûsên helbestvanan e
dê rojnivîska destana te binivîsînin.
Galegala stranên dengbêjan e
dê bêdengiya şevên tarî biçîrînin.
Himehima derwêşên zikirxaneyan e
dua û dirozgeyan li pey te dixwînin.
Qîjeqîja berpirsên kurdan e
mîkrofon û kursiyên zilmê dişkînin.
Terterpa dilên ciwan e
li Girê Miştenûrê find û qendîlan vêdixînin.

Hey Kobanî, hey mûzeya bêgunehan!
Bihişt sermedî ye
û dê nekeve destê zebaniyan!
Hey meşqxaneya gelê çekdar!
Hey eşqxaneya gelê şoreşvan!

*08.10.2014, Bazîd*

**DESTANA ROBÎN KURD**

**I.**

Bajarê Bazîdê bajarekî qedîm î giran e

Li nava pênc çiyan e

Her du Agirî li gel Bêçare, Girê Zikdiriyayî û Tendûrekê li dorê civiyane
Salnameya wê li ser sê sed û şêst û pênc rojan e
Her rojek bi qasî bîst û çar saetan e
Merqeda Xaniyî vekirî ye ji bo ziyaretan e
Helbest û ramanên wî li ber destê keç û xortan e
*02.03.2018*

**II.**

Mem û Zîna Xaniyî ji bihatirê berheman e
Hatiye şîrovekirin bi werger û şerhan e
Ji wan şerhan yek jî aydî Mela Mûsayê Celaliyan e
Hatiye amadekirin bi erebî û zimanê kurmancan e
Hatiye sererastkirin bi alîkariya Umîd Demîrhan e
Ev berhema şahkar li ser şêst beşan e
Her beşek xwediya hinek taybetiyan e
*02.03.2018*

**III.**

Çend rojan piştî eydeke qurbanê
Mela Mûsa gazî kiriye Omitê Mistefê bi telefonê
Gotiye: Mamoste were, rûne li vê meydanê
Tewleyê nijdan, boşên deveyan, keriyên miyan bihêle li dera hanê
Xwediyên kûpên zêran, dikan, çarsî û bazaran kanê
Were, em amade bikin ji bo şahidiya dewranê
Şerheke sermedî ji bo dîwana Mem û Zînê
Da ku em nemînin li aran û germistanê
Da ku em bigihêjin mirazê vê karwanê
Tevî alim û zanayan derkevine seyrana vê zozanê
*03.03.2018*

**IV.**

Omitê Mistefê bersiv daye: Seyda ronahiya şevan e
Eyd derbas bû, xwarzî vegeriyan ji malên xalan e
Biraziyan geşt û ger qedandin li malên apan e
Xwendekaran berê xwe dan zanîngehan e
Karker zivirîn ji seyran û betlaneyan e
Şervan ji aştiyê derbas bûn tevgera şeran e
Temenê min çil û sisê ye, dikevim çil û çaran e
Rebê Alemê daye min ilmekî giran e
Ku bi şeş zimanan dersê didim ciwanan e
Rojekê ez ê jî serê xwe daynim axa goran e
Bila pênûsa min li erdê nemîne, emanet bigihêje xwediyan e
Li min qebûl e, ez ê bikim li seydayê xwe hemû alîkariyan e
*03.03.2018*

**V.**

Rojek ji rojên Xwedê Bekirê Brahîm daye dû xwe mezinê kuran e
Mezinê biran digel bavê, berê xwe dane Helaca xopan e
Gihiştine derê mala Eysayê Pitê, ji bo xwestina du keçên Keçelan e
Bekirî Naza jinebî xwestiye, Mistefê ecibandiye biçûka xwişkan e
Mistefayê Bekir û Xatûna Eysa kişandine govendek edetî kurmancan e
Ji her duyan re çêbûne çar kur û sê keçên mîna sirahiyan e
Evdila, Elî, Xanim û Seyhe çêbûne; paşê hatiye dinê Omitê pêncan e
Hevalpiştên wî Henê û Metînê rêza heftan e
Navê Omitî, Xelîfe Reşîd lê daniye ku pêşengekî misilmanan e
Omit li gundê Noreşînê bûye, zarokê eşîran e
Eşîra wî Celalî ye, ji milê Keleşkiyên Sakan e
Dor û berê Çiyayê Agiriyê war û milkê wan e
Bekirê kalikê Omitî şer kiriye li Agiriyê çend salan e
Paşê vegeriyaye gundê xwe, heta ku çûye rehmeta Rehman e

*03.03.2018*

**VI.**

Gundê Noreşînê li sêgoşeya du kêrtan e
Çemek ji navê re dikişe; digihêje mêrg, zevî û şovan e
Darên qeysî, alûç, hirmê, sinc û sêvan li hev aliyane
Besta wê kêfa cotkaran tîne; çavên şivanan li çiya û baniyan e
Ji Kêşa Hecî Beko derbas dibî Berê Zindaran e
Ji wir digihêjî Hêsiyê û Zeviya Ozman Axan e
Ji Gêlî re dibihurî Aliyê Mêrgan û Devê Dotikan e
Biharê li quntaran mikemika kar û berxan e
Li çêregehên jorîn kalekala mî-bizinan, orîna dewaran e
Guregura traktorên li bestê derdikeve esmanê heftan e
Keçên xama diçine devê avan, berhev dikin pûng û pincaran e
Xort dest di cêban de, bi fîtefît û hîkehîk dikin karê tucaran e
Havînê mal diçine zozana Şêresiyarê, warê Keleşkiyan e
Li aranê çitîniya meriv û heywanan tuneye, tenê dengê erebeyan e
Qîrçeqîrça kêlindî, şene û darmixan e
Hoyehoya serhozan û paleyan zeft dike bêdengiya mêrg û zeviyan e
Serê xanî û banan zer dike bi hişkkirina mêwe û qaxan e
Bêder di nava toza ka û patosan de mane
Ceh û genimê lêxistî bi bardan û çehlan e
Zikata wan ragirtî para feqîr û fuqeran e
*03.03.2018*

**VII.**

Payîz li Noreşînê ba-bager, şilî-şilope û hişkeserma ne
Pelên daran diweşin mîna xîreta gunehkaran e
Çem û mij digire serê çiyan, êdî zûrezûra gur û roviyan e
Serê çileyan pez tê girtin, qirş û qal li erdê nemane

Teslîmî zivistanê dibe gund, berfa spî mîna ihrama heciyan e
Gundî li malên mezin dicivin; dema qerf, lîstik û henekan e
Çîrok, stran û gotinên pêşiyan dubare dibin car caran e
Ciwan ji xebatê vedigerin, ji bo biharê dikin tivdîran e
Kal û pîr li ber sobeya germ dihênijin û dikşînin tizbiyan e
Zarok li ser qeşayê xwe li tîlê dixin, dişqitînin xizagan e
Jin tevna datînin; dihûnin fayke, gore û lepikan e
Mêr diçine sêz, bi dasan diçinin qamîşê avahiyan e
Xwenda bi înternetê dişopînin Omitê Mistefê ku gundiyê wan e
Keç resmên wî nîşanî hev didin ku kekê wan dîsa diqijirîne kilaman e
Heval bi bîr tînin xatireyan, şa dibin bi serbilindiyan e
Xêrnexwaz diranan diçirikînin bi bihîstina serfiraziyan e
*04.03.2018*

**VIII.**

Omitê Mistefê li Noreşînê dest bi xwendinê kir li dibistana tirkan e
Wekî her zarokê mehrûm nedît çand û zimanê bav û kalan e
Li mizgefta gund elifbêka erebî qedand, ku paşê jî Quran e
Payîz, zivistan û biharê xwend; havînan çû ber berxan e
Hînî çîrok, destan, zûgotinok û tiştonekan bû tevî zarokan e
Hînî stran, govend, siwarî û şeran bû tevî mezinan e
Li cem pîrejinan rûnişt û bihîst serpêhatiyên kurdan e
Li ba kalan bihîst dîroka mêrxasên eşîran e
Sala duwanzdehan çû Bazîda ku navê wê eyan e
Dest bi xwendinê kir li lîseya xetîb û melayan e
Pola pêşîn li mala apê xwe yê Ezîz ma bi mehan e
Pola duyem xwend bi alîkariya Ehmed, apê heftan e
Pola sêyem xwend li mala Elî ku ji mêrxasan e
Pola çaran çû Agiriyê bi imtihan û bûrsan e
Polên pênc û şeşan jî li wir xwendin tevî xortan e

Pola heftan a dawîn dîsa vegeriya nav eqreban e
Bi vî awayî qedand lîse û heq kir karê melayan e
Lê nebû mela û berê xwe da Stenbol û dewletên ereban e
*05.03.2018*

**IX.**

Heywax dilê min î liyan e, Omit li welatê Misrê û Sûdan e
Erebî xwendiye li Ezhera Eyûbiyan tevî ereb û biyaniyan e
Huqûqa berawirdkirî xwendiye li Xortima Sûdan e
Enstîtuyek qedandiye ji bo zimanê ingilîzan e
Dema ku vegeriyaye malê, birine eskeriya tirkan e
Ji eskeriyê firar kiriye bi roj, hefte û mehan e
Reviyaye welatên dereke û xwe nedaye destan e
Paşê dizivire welêt li ser xatirê dê û bavan e
Bi balafirekê hatiye Stenbolê û ketiye hebsan e
Piştî Girtîxaneya Metrisê şandine ya Pinarhisaran e
Li girtîxaneyê dibihîze mirina diya xwe ji biran e
Ew dayika şîr û hiş dayê, kire dêv zar û ziman e
Dibêje: Rehma Xwedê lê be, hêsîrî bendê piyan e
Ez ê dua û fatiheyan bixwînim digel hevalan e
*07.03.2018*

**X.**

Zivistaneke sar Omit vedigere Noreşîna ku warê bav û kalan e
Çendekê diçe Îranê û bazirganiyê dike, hîn dibe zimanê farsan e
Paşê li Bazîdê bi cih dibe, dizewice bi keçeke eqreban e
Vir de wê de dixebite, heta ku dibe bavê sê zarokan e
Omit dest bi wergerê dike û berê xwe dide Stenbola xopan e
Diçe qursa mamostetiyê, ji Enstîtuya Kurdî digire dîplomaya ziman e
Ferhengeke kurmancî bi kurmancî amade dike, bi navê Ferhenga Destan e

Ev ferhenga kurmancî ya yekem e li bakur, ji ber ku neweşiyabû ya bedirxaniyan e
Dibêje: Ez ê hewl bidim kurdî bikim zimanê perwerdehiyê û zanistan e
Bila kes nebêje kurd bê çand û ferheng in, nizanin bayê dunyayê çawan e
Bila kurd nebêjin em bêkes in, stûxwar li ber dîwaran mane
Bila dinê alem bizanibe ku va ye kurd jî li meydanê hene
Tenê kurdî ji wan re bingeha çemkê ye û zimanê axaftinan e
Bi alfebeya Masî Soratî nivîsîne, dîroka wan kevnezeman e
Paşê vedigere Bazîdê, dibe mamosteyê zimanê kurdî li dersxaneya Orhan Dogan e
Du cild pirtûkên perwerdehiyê amade dike, niha li ser malperên înternetan e
Du pirtûkên helbestan nivîsîne, peyda dibin li ser malperên kurdan e
Ji bo misilmanan wergerandiye çavkaniyeke girîng a hedîsan e
Li ser devok û zaravayên kurdî xwediyê gelek lêkolîn û gotaran e
Li ser malperan û kovarên Fritillaria Kurdica, Kurmancî û Zendê weşiyane
Ji Sun Tsu wergerandiye pirtûka stratejiyan a bi navê Hunera Cengan e
Dildarekî zimanê kurdî ye, bawer dike bi hêza peyv û pênûsan e
Di daristana edebiyatê de hilbijartiye rola Robînê Kurdan e
Bi van helbestan pesna xwe nade, xizmeta avdanê dide daran e
Da ku wêjeya kurdî nebe çolistan, bişavtin bi ser nekeve tu caran e
*11.03.2018*

**XI.**

Omitê Mistefê îro serê sibehê destê xwe bire kerika guhan e
Stranek avête ser gelê xwe yê ku jiyana wan timî berxwedan e
Go: Sed aferîn kurdino! Roja xîretê ji bo zarok, pîr û jinan e
Bav û kalên we baca kerxaneyan nedikirin budceya dewletan e
Mêrxasên we li sifreya neyaran rûnediniştin, ji bavê xwe re nedidan çêran e
Jinên we hînî zimanên biyanî nedibûn, nediherişandin rûmeta mêran e
Mêrên we nediçûn nivîna heram, bîj nedidan hembêza jinan e
Şîrê diyan heram bû li zarokê ku nediaxivî bi zimanê kurmancan e
Nifira bavê li dû wî kesî bû ku bixape bi gotina serekê xelqan e

Liv û tevgera serokên wan ferman bû bi rê û resma miletan e

Bi yek dengî û hezar rengî êriş dibirine ser zilm û neheqiyan e

Kurdo sed aferîn! Kanalîzasyona Karakoyê nalewitîne rûbar û çemên wan e

Mêrxasên wan berdidin paşmayeyên Dehak, Ebûcehl û Cengizxan e

Pişta xwe dispêrin çiyayên Xwedê, li deştê datînin rêbaz û mercan e

Bi siyaset û riyaseta cîhanê beled in, bi maf û berjewendiyan şareza ne

Wê şaristaniya xwe ava bikin, li ser hîmê qencî û pakiyan e

Wê bi enqaza pûtên kevnare çêkin rê, dirb û pireyan e

Wê rûmeta wan bê girtin, jixwe her kes radimûse destên mezinan e

*16.03.2018*

**XII.**

Heylo zemano xweş zemano, tam jî dema xwenaskirina kurdano

Yekîtiya Neteweyan hilweşiyaye ber şêmîk û hewşên kurdano

Qanûnên wê riziyane, maye li benda kirasguherîna kurdano

Berdevkên wê ji şerman bûne pêlîstokên destê zarokano

Nahêle li Ewropa û Amerîkayê kevirek biheje ji şûnano

Kevirek li ser kevirê kurdan nemîne jî ne xema wano

Nahêle li mala malmezinên wê kesek bike tir û fisano

Lê bêçav û bêguh e dema ku welatê kurdan tûş dibe li jehr û bombano

Nahêle qirş û qal li ber derê zordestên wê bimîne li erdano

Lê çarsî û bazarên kurdan qirêj kirine bi çop, jop û gendeliyano

Zarokên karbidest û hevalbendên wê ji kêfan teqiyano

Lê zar û zêç, kal û pîrên kurdan li serê riyan perîşano

Ji bo rizgarkirina pisîkekê radike tîm û artêşano

Lê ji bo sekinandina qirkirina kurdan bêwijdano

Piştgirê ala, sirûd, artêş û dewletên hevalbendano

Bi wan hevalbendan piştê dişkîne li belengaz û kurdano

Mafê dewlet û hebûnê dide tax, gund, eşîr û bajarano

Mafê jiyan û pêkvejiyanê zêde dibîne li gel û welatê kurdano

Qanûn û biryaran derdixe ji bo rehetiya ziktêrano
Zikbirçî û şerpezeyên kurdan nabîne bi çavano
Artêş û bombeyên zikmezinan pîroz dike bi cejnano
Jaran dipirçiqîne di bin zexta postalên hovano
Heylo zemano xweş zemano, tam jî dema xwenaskirina kurdano
Dema plandanîn, avakirin û rêvebirina stratejiyên xaskurdano
Ewên ku ji nava dil, hiş û hestên kurdan derketine bi qeys û pîvano
Stratejiya xebatê berdest û amade dibe bi rêzikname û hêzano
Nexweşiyên berê derman dibin bi tedawiya bijîjkan û dermano
Xetereyên teze derdest dibin bi hêz û rêz û fêz û mêz û parêzano
Kurdo, bigire van pend û şîretan! Bike nava perwerde û meşqano
Qenc bimeşe kurdo bi resm û fermanên zelal di nav rêza xelqano
Tu navmal û pêşmala xwe paqij bigirî tu yê bibî kulîlka taxano
Kurdo pêşiyê erd û milkê bavê xwe nas û zeft bike bi destano
Li gorî erdê xwe amade bike plan, proje û veberhênano
Li gorî hêza xwe dest biavêje kar û baran, ji bîr neke dijminano
Bibe kelemê çavên neyaran û agir berde dil û cergê wano
Heke bi min bawer nakî binêre gotinên pêşiyan û dîrokano
*22.03.2018*

**XIII.**

Omitê Mistefê hevpeyvînek li dar xist digel malbata xwe wan rojên han e
Nihêrî ku dilên xwe jê kirine ku stranekê navêje ser wan bi navên wan e
Lewre vê êvarê destê xwe bire guhan û li xerîbistanê qîriya bi van rêzikan e
Go: Diya zarokan Seyheya Mihemedê Fazil e ku ji desteya Mala Çowan e
Nixuriya min Humeyra Xatûn e û kurê mezin bi navê Alî Îmran e
Kurê biçûk Mistefa Merd e û her sê jî dixwînin li dibistaneke tirkan e
Zarokino bibexşînin ku bavê we mijûl e bi dayîna fayiza deynê bav û kalan e
Bav û kalên me nehiştin ji me re dem û dezgehên xaskurdî mîna xelqan e
Lewre bavê we temenê xwe pûç kir di riya sazûmaneke aydî kurdan e

Lewre ev çendîn sal in ku têkoşînekê dide ji bo pêşvebirina ziman e
Zarokino bibexşînin ku bavê we nekarî we bişîne mekteba kurmancan e
Li we bike cil û bergên aydî bazîdiyan ku keleha eşîra Celaliyan e
We bi ziman û edebiyata kurdî perwerde bike bi destê mamosteyan e
Dîrok û erdnîgariya kal û bavan nîşan bide bi nexşe û etlesan e
Feraseta we xurt bike bi çîrok, destan, helbest û gotinên pêşiyan e
Nav û nasnavê we bi kurdî bide tomarkirin li rêza navên biyaniyan e
Bi rastî ev gişt ne barê min belengazî ne, peywira dewlet û saziyan e
Lêbelê kesê mehrûm mafdar e ku bike gazî, gazinc û daxwazan e
Ez beriya we mehrûm bûm, beriya ku hûn werin li ser van erdan e
Bîr nekin ku min û diya we bi kurdî hûn elimandin, ji we re tuneye bihane
Her dem bi kurdî biaxivin, bi kurdî bifikirin û neçin ser edetên axoziyan e
Zêde televîzyonên biyanî temaşe nekin, guh bidin gotinên mezinan e
Hûn ê jî mezin bibin, ji zarokên xwe re bikin van pend û şîretan e
Xwedê alîkarê we be û we biparêze ji şeteleyên şev û rojan e
*28.03.2018*